



WELAT

V
an rojêñ
dawîn di
qada
neteweyî û
navneteweyî de
çalakiyêñ aştîxwaz
zêdetir dîbin. Digel
konferans û meşen ku
pêk têñ, sûcêñ dewletê
li dadgehêñ
navneteweyî û heta di
raporêñ saziyêñ wê bi
xwe de jî têne zimêñ.
Lê dîsa jî rayedarêñ
tirk dixwazin dengê
kesen ku qala
çareseriya kêseya
kurdi dikan, bi darê
zorê bibirin. Lewre li
gorî wan çareserî di
pişäftina kurdan de
ye, ji ber vê yekê jî
radyoyan li kurdan
belav dikan.

Rüpel: 3



Her bûyer çareseriye dide pêş

Şehid-Jinenigarî:

Ji Bexçeyê Şehîdan,
guleke ciwan, Nalîn Hisso

R. 8-9

Civak-Jiyan:


Xwediyêñ welatê dagirkirî
Gelê Same

R. 16

Pexşan-H. Mehmet Korhan:

Bayê çiya
bayê azadiyê ye

R. 6



SAMİ TAN

Mafê berxwedana li hemberî zilm û zordariyê di hemû bîrdoz û baweriyên pêşverû de cihekî mayende girtiye.
Di zanista ramyarî de, zanyar li gorî vê pîvanê ji hev tê neqandin.

Canda gel ji hêla ravekirina mijaran ve metelok, gotinê pêşîyan û biwéjan gelek bikêr e. Mijarîn ku mirov nikare di dehan rûpelan de şrove bike, gotineke pêşîyan, metelokek an ji biwêjek bi serê xwe têrî ravekirina wê dike.

Bo nimûne, di nava gel metelokek heye; "Dema dixwaze kêfa evdeki xwe yê reben bîne, pêşî kera wî winda dike, piştire ji pê dide dîtin." Bi vî awayî ji ew dibe spasdarê Xwedê.

Her wekî di kurdî de tê gotin "bêmâne" be, lê piştî êrişa li diji Serokê Mafêni Mirovan Akîn Birdal li hinek mirovan wisa hat. Li helwesta tûj a raya giştî, (li gorî hinek kesan ji ji ber nakokiya di navbera artêş û polisan de) êrîşkar hatin girtin. Piştî ku plansazê êrîşê ji nava artêşê derket, Serfermandariya artêşê daxuyaniyek da û zivîrbûna xwe (!) diyar kir. Pişt re ji di civîna MGK, generalen tirk girtina çeteyan xwestin.

Li ser vê yekê hinek derdorê. "sivil"

dest bi pesindayina helwesta MGK'ê kîrin. Li gorî wan ew bîryara MGK'ê bîryareke dîrokî ye, lewre ji pêwîst MGK bê pîroz kîrin û ji wan bê xwestin ku li ser vê derbest bin.

Lê zêde wext di ser vê daxuyaniyê re derbas nebû, êrişen li diji rewşenbîr û saziyên demokratik zêdetir bûn. Piştî salekê Eşber Yağmurdereli ji nû ve hate girtin. Cerdîn li ser HADEP'ê zêdetir bûn. Xuya ye ku wê zêdetir jî bibin. Ji ber ku kana çeteyan şerê taybet e û niha dilê rayedaren dewletê (çi resmî, çi ji sivil) nîn e ku di vî warî de gavekê bavêjin.

Lewre ji kesen ku bi rastî aşî û azadiyê dixwazin divê hêviya xwe bi bîryarîn MGK'ê ve girênedin. Mafê kesî nîn e, gel bi xewnerojan bixapîne.

Li aliye din mafê berxwedana li hemberî zilm û zordariyê di hemû bîrdoz û baweriyên pêşverû de cihekî mayende girtiye. Di zanista ramyarî de, zanyar li gorî vê pîvanê ji hev tê neqandin. Yen ku mafê berxwedanê diparêzin "pêşverû" yên ku vî mañî nas nakin ji

kevneperek û paşverû têne hesibandin. Ji ber vê yekê ji, tu kes nikare bîbêje, "Em li dijî her cure şidetê ne." Kesê ku vê bîbêje; rasterast piştevaniya şideta serdestan a rîkxitî ye û "hiqûqi" dike.

Rast e, mirov dikare, karekî an ji livbaziyekê di cih de nebîne û rexne bike. Lê dema yek li hemberî ev qas zilm û zordariyê bêdeng bimîne û piş re ji rabe, ji tiştekî xwe re bike hincet da ku êrişî doza azadiyê bike, wê çaxê edî li wê helwest bi çavekî din bê nihertin, ji ber ku di bin vê helweste de niyete xerab heye. Lewre kesen ku pesna bîryara MGK didin û dijberiya xwe li dijî her cure şidetê diyar dikin ji baş dizanîn ku iro li seranserî Kurdistan û Tirkîyeyê hêzeke tundisperest deshilatdar e.

Hêza ku çeteyan pêk tîne û li dijî gel bi kar tîne, rewşenbîran digire, komikên faşistan dajo ser xwendekaran, gundan dişewitîne ew hêz e. Serkêsiya vê hêzê ji fermardarê artêsa tirk dikin. Nêxwe mafê me nîn ku em li ser navê aşîxwaziyê pesnê wan bidin û bi daxuyaniyê xwe dilê, xwe xweş bikin.

Aştiya kurdan aştiya gelan e

M. ZEKİ ETİZ

Ferhengok

- asê:** bilind (sar)
- bengî:** muptela (tutkun)
- berzekirin:** wîndakirin
- berzûri:** lava,
- beybûn:** papatyâ
- bîrov:** vucûd mantarı
- bobelat:** karesat, felaket
- dabeskîrin:** parvekirin
- daqûlbûn:** veyatin, xwarbûn
- deling:** paçık (paça)
- dembûbêrk:** sohbet
- digel:** ligel, tevî
- dilsoz:** sâdik
- dojeh:** cehennem
- duriskîrin:** çekirin, pêkanîn
- endazîar:** muhendis
- felişîn:** hilweisîn, rûxîn
- fericîn:** lêtemaşekirin
- gewre:** mezin
- gopîtk:** lûtke, zîrve
- handêr:** teşwiqkar
- hungor:** dânan
- navbera:** êvar û şevê
- kese:** pâpaz
- kevnare:** dêrîn, antîk
- keysbaz:** keysperest
- ko:** hembêz; çiya
- koncal:** kortal
- kutakirin:** qedandin
- landik:** dergûş
- nepenî:** veşarî
- pakrewan:** şehîd-pato: hevîrê tê nepiyyayî
- parzemîn:** qita
- petax:** hilweisî, kavîl
- rimilk:** toz û xubar
- rîst:** rol; misra
- selmandin:** ispatkirin
- simûç:** neynûkên
- sewalan:**
- sobanî:** avjenî, melevanî
- sûsk:** orman tavuğu
- tixûb:** sînor
- tomarkirin:** qeydkirin
- welê:** wisa, wilo, wer
- weza:** sewalân jar
- xemşok:** çîrok
- xilt:** koremişk
- zagon:** qanûn
- zîro:** kurmê kaniyan

Heyîna aştiyê bi xwe re heyîna şer ji holê dide rakirin. Ji ber vê yekê mafê împêrialist û xayinan tune ku li ser aştiyê bîpeyi-vin. Lewre bêyî xwînriyandina mirovîn bindest ew nikarin bijîn. Ji bo wan aşî tirsa herî mezîn e.

Kesen ku li dijî zilmê li ber xwe didin, xwazgîniyê jiyaneke nû ne. Ev kes bîratîxwaz û aşîxwaz in. Lewma divê ev kes qala aştiyê bikin. Ji ber ku mirovîn bindestî û perîşanî nedîstine û li diji kedîxwariyê têkoşîn nedane, qîmeta aşî û azadiyê nîzanîn. Lê belê xwazgîniyê jiyana nû dîkarin berxwedanê bêhempa bidin meşandin.

Cîra ji beriya çend salan, tu kesî qala aştiyâ di navbera Komara Tirkîyeyê û gelê kurd de nedîkir? Ji ber ku, behsa aştiyê di dîrokê dê, bi heyîna şer ve girêdayî ye.

Ev şerê ku artêsa tirk li ser xaka Kurdistanê didomîne, ne ji bo gelê kurd tenê, ji bo pêşveçûna gelê Tirkîyeyê ji astenga herî mezîn e. Lewre gelên Tirkîyeyê bi şerê taybet ji mafê xwe yê aborî, ramyarî, komelayefî û însanî bêpar maye. Edî tu kes nikare behsa heqê xwe yê jiyanê bike û daxwaziyê xwe bîne ziman.

Belê, wê ev pirsgirêk çawa bê çareskerin? Pêwîst e aştiyekê ku wekhevî, demokrasî û vîna gelan bi-

nimîne, di nav gelê kurd û tirk de bê danîn.

Wekî diyar e, pirsgirêkên grîngtrîn bi hêsanî çareser nabin. Her tiş bi xebat û çalakiyê xurt pêk tê. Aşî wê çawa çêbîbe? Kî yê serokatiya wê bîke? İro çalakî û têkoşîna ku ji bo aştiyê tê meşandin pir jar e. Çiqas însanîn ku aştiyê dixwazin di hejmara xwe de gelek bin ji, lê ji ber ku ji hev belav in, ev xebata wan deng venade. İro rîexistineke ku di nav gelê

İro rîexistineke ku di nav gelê tirk de, qala vî şerî qirêj bike nîn e. Ka ev şerê hanê ji bo ci tê meşandin?
Cîma her roj bi dehan însan dimirin? Bingeha bihabûnê ci ye ?
Ji ber vê yekê pirsgirêka herî girîng avakirina tevgereke berfireh e.

tirk de, qala vî şerî qirêj bike nîn e. Ka ev şerê hanê ji bo ci tê meşandin? Cîra her roj bi dehan însan dimirin? Bingeha bihabûnê ci ye ?

Ji ber vê yekê pirsgirêka herî girîng avakirina tevgereke berfireh e. Pêwîst e hemû mirovîn aşîxwaz di navê tevgerê de cihê xwe bigirin û rîexistineke xurtir bidin meşandin. Şerê Azadiyê hem ji bo vê yekîtiyê hem ji bo çekirina hêzeke politîkî pir derfet afirandine. Ya girîng ew e ku, ev êni were damezrandin û di pratîkê de bê meşandin.

Di vî warî de barê giran dikeve li ser milê gelê tirk. Ji ber ku aliye aştiyê ew in, ne têkoşîna mirovahiyê ye. Ev nayê vê wateyê ku gelê kurd aştiyê naxwaze. Tê zanîn ku Bizava Azadiya ev demeke dirêj e li Kurdistanê, ji bo aştiyekê demokratik bide afirandin, şer dike. Çawa ku Serok ji dide xuyakirin: "Vê gavê qumanda aştiyê di destê me dabe, çawa ku em dixwazin wê bixebeitînin, ev kar pir bi piranî diçe çareseriye." Lê ev qumanda ne di destê Bizava Azadiyê de ye. Lê gelê kurd ji wan re dikare bibe alîkar. Ji ber vê yekê pêwîst e, gelê tirk bi dilawerî çalakiyê xurt ji hêla rîexistin û ramyarî de, li dijî şerê qirêj bide meşandin.

Dîv bê zanîn ku, astengen di nav civaka gelê kurd û yê tirk de hene, hemû bi aştiyê ve girêdayî ye. Çawa ku Serok ji dibêje: "Aşî di heman demê de şerê nan e! Di heman demê de azadî ye! Aşî di her wiha bi hêzbûna ramyarî ye. Dîsa aşî kar dîtin e. Aşî qezençkirina nîxen çandî û morale ye."

Bi kurtahî, ger gelê tirk dixwaze ji vê rewşa nexwes xîlas bibe, pêwîst e ji bo damezrandina aştiyê hemû derfetên xwe bide şixulandin. Lewre bi awayekî din ne gengaz e ku gelê tirk rizgar bibe û di cihanê de jiyaneke bi aşî û dilxweşî derbas bike. Her wiha pêkhatina aştiyê, politîkaya împêrialistan ku li ser navê 'aştiyê' dixwazin koletiyê li gelan bikin, bêkêr dike.

Her bûyer çareseriyê dide pêş

Îro, ci xebata ku qala mafêñ kurdan bike, mora PKK'yibûnê lê tê xistin. Nimûneya herî berbiçav a vê helwestê Rapora Koçê ya Meclîsa Tirkîyeyê ye. Ji ber ku di vê raporê de qala mafêñ çandî yênd kurdan tê kirin, Wezîrê Karêñ Hundirîn Murat Başesgioğlu gef li amadekarêñ raporê xwar, da zanîn ku ew di bin bandora MED-TV'ye de mane.

Gelek çalakiyêñ ku li derive û hundir diqewimin, çareseriya kêseya kurd didin pêş. Li Ewîpayê kurd amadekariya meşeke mezin dikin. Wisa tê hêvîkirin ku, bi deh hezaran kurd besdarî vê meşa li Frankfurt Almanyayê bibin û daxwaza xwe ya aşti û azadiyê bînin zimêñ. Li nik vê çalakiyê, gelek civîn û konferansê navneteweyî li cihêñ cur bi cur ên cihanê li dar dikevin.

Berê bi tenê li Ewîpayê çalakiyêñ tekildarî kurdan li dar diketin. Lî edî ew pêgêh firehtir bûye. Digel herêma di bin kontrola Rûsyayê de, edî li wela-tên ereban jî çalakiyêñ bi vî rengî pêk tê. Pişti civîna Qahîreyê, hefteya çûyî civînek jî li Bêrûdê pêk hat. Ji welatên cur bi cur, kesen siyasetmedar û akademîyen besdarî vê konferansê bûn. Mi-jara bingehîn a vê konferansê helwesta dagirkêr a Tirkîyeyê bû. Li gorî besdarîn civînê, çavêñ dewleta tirk di erdê welatên cîran ên wekî Qibrîs, Yewna-

nîstan, Ermenîstan û Sûriyeyê de heye. Her wiha di konferansa ku bi hevkariya PKDW û Weqfa Piştigiriya Ermenan hatîye lidarxistin de jî, çareseriya kêseya kurd hate xwestin.

Diranêñ qurbaniyêñ şerê duyemîn ketine kîsê Tirkîyeyê

Li Rojhilata Navîn, İsrail wekî tekanne dostê Tirkîyeyê tê destnîşankirin. Şerê ku Tirkîye li dijî kurdan dimeşîne, bi alîkariya çalak a vê dewletê tê meşandin. Bi pey agahiyan, çalakiyêñ dewleta tirk ên li başûrê Kurdistanê bi daxwaz û şêwirkariya İsrail û Amerîkayê tê meşandin. Pişti raporeke li ser şerê duyemîn ê cîhanê, dê têkiliya her sê dewletan (Amerîka, İsrail û Tirkîyeyê) wekî berê nemeşe. Lewre li gorî vê rapora ku ji hêla rayedarê amerîkî ve tê piştevanîkirin, Tirkîyeyê beramberi kromê ku firotiye rejîma Naziyan, zê-rêñ ku ji cihûyan hatine desteserkirin,



Komîsyona Koçberiyê ya Meclîsa Tirk jî, pejirand ku gundêñ kurdan bi destê hêzêñ tirk hatine şewitandin.

daye Tirkîyeyê. Li gorî rapora navborî Tirkîyeyê di sala 1943'yan de %100 pêdiyiya naziyan a krom peyde kiriye. Di sala 1944'an de jî li dora %60 pêdiyiya wan peyde kiriye. Bi vê yekê jî bûye sedema dirêjbûna şer. Zêrêñ ku Tirkîyeyê ji naziyan girtine, diranê zê-rêñ û gustilêñ cihûyêñ ku di firinan de hatine şewitandin in. Li gorî Cîgirê Wezîrê Aborî, Kar û Çandîniyê Stuart Eizenstat rezerva zêran a dewleta tirk berî şer 27 ton bûye, lê pişti şer bûye 216 ton.

Konferansek jî II

Brûkselê

Di navbera 12-13'ye pûşperê de içar li serbajarê Belçika Brûkselê bi pêşengîya Konfederasyona Komeleyê Kurdistanê ya li Ewîpayê (Kon-Kurd), bi navê "Li Kurdistanê Mafêñ Mirovan" konferansek tê sazkarin.

Di vê konferansa ku bi piştevâniya Yekîtiya Hiqûqnasêñ Kurdistanê pêk tê de, gelek saziyêñ kurd û biyan besdarîyê dikin û mijarêñ cur bi cur ên tekilda-rî mafêñ mirovan têne gengeşekirin.

Rapora Komîsyona Koçberiyê ya Meclîsa Tirkîyeyê

Li aliye din li hundir hin xebatêñ ku dikarin rastiya civaka kurd (bi sînor be jî) bînin zimêñ, derdi kevin holê. Rayedarêñ dewletê jî çareyê di girtina kesen rewşenbir, heke ew jî têrê neke bi destê çeteyan dankuştina wan de dibîne. Wekî ku rewşenbirêñ mîna Ismail Beşikçi, Haluk Gerger, Hasan Özgün, Hü-

seyin Karataş, Edip Polat û hwd. ne bes bin, Eşber Yağmurdereli jî ji nû ve hate girtin. Niha qala girtina birek rewşenbirêñ din tê kirin. Her wiha qonaxa McCarty ku bi girtina Şemdin Sakîk dest pê kir, hê jî didome. Hefteya çûyî kesen mîna M. Ali Birand, Cengiz Çandar, Yavuz Gökmen ifade dan dozgeren DGM'ê. Dîsa ci kesê ku qala aştiyê bike, dibe hedefa dewleta tirk. Stranbêj İbrahim Tatlıses jî ji ber ku di bermameya xwe ya televîzyonê de pes-nê aştiyê daye, ifade da dozgerê DGM'ye.

Îro, ci xebata ku qala mafêñ kurdan bike, mora PKK'yibûnê lê tê xistin. Nimûneya herî berbiçav a vê helwestê Rapora Koçê ya Meclîsa Tirkîyeyê. Ji ber ku di vê raporê de qala mafêñ çandî yênd kurdan tê kirin, Wezîrê Karêñ Hundirîn Murat Başesgioğlu gef li amadekarêñ raporê xwar, da zanîn ku ew di bin bandora MED-TV'ye de mane. Ev bûyer giştî nîşana tesbîta destpêkê ne. Edî gelek derdor qala çareseriye dikin, lê her kes ji çareseriye tiştekî fêm dike. Hinek ji bo çareseriye pişaf-tina kurdan pêwîst dibîmin, lewre jî kur-sen perwerdehiya bi tirkî didin destpêkirin, ew jî têrê naake radyo yan li gel belav dikin. Hinek dixwazîn aliye kî şer li derveyî xebatêñ aştiyê bihêlin û aştiyê pêk bînin.

Lê, diyar e ku xwedîyê gotina dawîn gelê kurd û yêñ nûnertiya wan dikin in. Ji ber vê yekê jî ligel çalakiyêñ navneteweyî, xebatêñ ji bo bidestxistina aştiyê, şer jî gur dibe.

NAVENDA NÜÇEYAN



Dîmenek ji konferansê li ser kurdan ên li Ewîpayê.

BERNAMEYA KONFERANSA BRÜKSELÊ

Konferans ji çar beşan pêk tê:

I. Bingeja Kêseya Kurd
Axîfbêj: Kon-Kurd

II. Pêpeskirina (ihlal) mafêñ
mirovyan

a) Di navbera salêñ 1980-97'an de
pêpeskirina mafêñ mirovan

b) Ji 1990'i heta îro pêpeskirina
mafêñ mirovan: pirêzeya şerê kirêt

Axîfbêj: IHD, Mazlûm-Der, Heyva
Sor a Kurdistanê, nûnerêñ komeleyêñ
malbaten girtiyan, KESK û Petrol-İş

III. Pêpeskirina Mafêñ Siyasî û
Demokratik
Axîfbêj: PKDW/HADEP


IV. Ji ber nêzîktêdayina li hemberî
çapemeniyê pêpeskirinê ku pêk hatine.

Axîfbêj: Yekîtiya Rojnamegeren
Kurdistanê û Nûnerê/a Rojnameya
Ülkede Gündemê


Pêpeskirinê mafêñ ên di warê
çandî, perwerdehi û tenduristiyê de û
êrişen li ser kesen ku di van waran de
xebatê dikin.

Axîfbêj: Eğitim-Sen, SES, YMK


Yêñ ku berze dikin, dê berze bibin!



Savaş Buldan



Hacı Karay



Adnan Yıldırım

Em hez ji we dikin û we bi bîr tînin
Qet xeman nexwin

Em kujerên we baş dinasin

Jixwe ew jî xwe venasêrin

Hinekî bi quretî, hinekî jî bi tîrs û saw dijîn

Kesêñ ku ala we nexistin erdê jî

Bi bîr û baweriyeke xurtir têdikoşin.

*Bîranîna wan di têkoşîna me de jîndar e!
ZELAL BULDAN, HÊLÎN YILDIRIM,
ENEZ KARAY*

Rêzimanê kurmancî

- Wane 14 -

SAMÎ BERBANG

Cînavkên pirsiyari

Ev cînavk pirsa tiştekî an jî keseki dîkin. Cînavkên ku pirsa kesan dîkin du heb in; "kî û kî". Yek ji wan xwerû yê din jî tewandî ye. Cînavka xwerû kî pirsa, peyva xwerû dike, ya tewandî kî jî pirsa peyva tewandî dike. Heke kesê ku pirsa wî/wê tê kirin, xwerû be pirsa wî/wê kesî/ê bi kî tê kirin. Yanê dema yek bibêje; "Kî dixwe?", dê bersiva wê jî navdêr an jî cînavkeke xwerû, "Zozan dixwe.", an jî "Ew dixwe." be. Dema cînavka me ya pirsiyari tewandî be, yanê pirsa "Kê xwar?" be, dê bersiva wê jî cînavk an jî navdêreke tewandî be. Li gorî pirsa jorîn dê bersiv wiha be: "Zozanê xwar." an jî "Wî/wê xwar." be.

Ew her du cînavk li hin deran dibin kirde li hin deran jî dibin bireser. Bo nimûne, dema bibêjin.

"Kî kî dibîne?" Di vê hevokê de kî kirde, kî bireser e. Heke em bibêjin, "Kê kî dit?" İcar, kî dibe kirde, kî dibe bireser. Li ser van her du cînavkên pirsiyari çend mînak:

Kî kî dibîne? Elî Zozanê dibîne. Yanê ew wê dibîne.

Kî nanî dixwe? Zozan nanî dixwe. Ew wî dixwe.

Kî ji kî fêkiyan distîne? Gulçîn ji

Zeryayê distîne. Ew ji wî distîne. Kî hat? Ez hatim. Kê got? Sidarî got. Yanê wî got. Cînavkê kî û kî bi gelempere pirsa keseki/ kesekê dîkin? Bi tenê digel lêkerên bûn pirjimar tê bikaranîn, wekî; Ew kî ne? Em kî ne? Ew kî bûn? Ew kurê kî bûn? Ew mirovê kî bûn? Ew gundiyen kî ne?

Ji bili van her du cînavkan hin cînavkên din ên pirsiyari mîna "kîjan, çend, çi" jî hene.

Ji van cînavka "kîjan", ji aliyê peyvsaziyê ve hevedudanî ye. Ji çend hîmanen pêk hatiye, wekî "kî-ji-wan". Taybetiyeke vê cînavkê ya din jî tewanbariya wê ye. Ev cînavk, qertafen tewangê digire û li gorî zayend û mîjerê diguhere.

Ji bo sayîkirina mijarê mirov dikare mînakekê bide. Kîjan nanî (nîn) dixwe?

Her wekî diyar e, li vê derê ji ber ku dem niha ye û kîjan jî kirde ye, li gorî rîpîvana tewangê xwerû maye. Lî dema em heman hevokê li gorî dema borî saz bikin, rews diguhere:

Kîjanê got? (mî, yekjimar)

Bersiv: Wê got.

Kîjanî got? (nîr, yekjimar)

Bersiv: Wî got.

û Kîjanan got? (pirjimar)

Bersiv: Wan got.

Ev cînavk jî dikare bibe kirde an jî bireser. Di hevoka, "Kîjanê kîjan dîtiye?" de, "kîjanê" kirde û "kîjan" jî bireser e.

Cînavkeke din ku cihê "kîjan" digire jî heye, ew jî "kîjk". Li gorî Celadet Bedirxan ew jî hîmanen "Kî-ji-wan-yek" pêk hatiye. Ev cînavk hemû taybetiyeke "kîjan"ê di nava xwe de dihewîne.

Dîsa cînavka "Çend" heye ku pirsa tiştekî pirjimar dike. Mirov nikare bibêje "çend hat?" divê mirov bibêje; "Çend hatin?" Ew cînavk li gorî mîjerê ditewe, lê li gorî zayendê natewe. Ew jî dikare di nava hevokê de hem bibe kirde, hem jî bibe bireser. Mirov dikare peywira ku ew digire ser xwe û rîpîvana tewandina wê di nava van hevokan de destîşan bike:

Çend çendan dibînin?

Çendan çend dîtin?

Di hevoka yekemîn de ji ber ku dema niha ye, kirde (çend) xwerû maye, bireser (çend) tewiyaye. Di hevoka duymîn de jî, kirde (çendan) tewiyaye, lê bireser (çend) wekî xwe maye. Her wekî ji bersivan jî xuya ye, cînavka "çend" pirsa jimarnavan dike.

Bo nimûne: Çendan dît? Çaran dît.

Di zaravayê kurmancî de cînavka

pirsyarî ku pirsa tiştan dike, cînavka "Çî" ye. Ev cînavk jî hem dibe bireser hem jî dibe kirde. Lî cînavka "Çî" netawê. Divê bê gotin ku kirdebûna wê tiştekî awarte ye, bi piranî dema heywanek karekî-tiştekî bike, ew cînavk dibe kirde. Ew bi gelemperi dibe biresera "kî û kî".

Bo nimûne: Kê ci xwar? Min nan xwar.

Min ci dît? Te dara sêvê dît.

Te ci kirî? Min ji te re pénûsek kirî.

Wan ci anî? Wan gûz anîn.

Çi nan xwar? Mişko nan xwar.

Çi hilkişi ser xêni? Dîk hilkişi ser xêni.

Çiyan eshed anî? Mirîşkan eshed anî.

Her çigas tewandina wan cînavka ne tiştekî asayı be jî, her wekî di mînaka dawîn de jî xuya ye, li hin cihan tewandina wan gengaz e. Mirov dikare çend mînakîn din jî bide, wekî,

Çiyê hêk kir? Mirîşkê hêk kir. Çiyê za? Mangeyê (çêlekê) za.

Ji xeynî wan cînavkeke pirsa cih dike jî heye. Ew jî cînavkê "ku" ye. Dema dibêjin, "Tu diçî ku?", wekî besiva yek dikare bibêje, "ez diçim gund." Xuya ye ku ew cihekî raberî mirov dike. Tiştekî zêde ku mirov li ser vê bibêje nîn e. Bi tenê mirov dikare ji bo zelalkirina mijarê, çend mînak bide:

Tu li ku büyî? Ew jî ku tê?

Hûn bi ku ve diçin? Mala we li ku ye?

Tu di ku de büyî?

Qirêjiya Başur-1

NEJDET BULDAN



Başûrê Kurdistanê demeke dirêj cihê gehremaniyê bû. Li dijî dagirkiran û nijadperestiyê şerekî dûr û dirêj hate meşandin. Ji bo dijminen gelê Kurdistanê bûbû cihê tirsê. Ji bo gelê Kurdistanê jî bûbû dergê hêviyan û herêmeke azad û serbixe. Pişî Şerê Kendavê cîhana rojava bi fermî mecalen dewletbûnê dan desten kurdan. Bi arîkariyeke siyasi, aborî û leşkerî jî ew mecal parastin. Eger hêzen kurd bikaribûna nakokiyen bi qirêj, ji mêjiyên xwe paqîj bikirana, fersendeke dîrokî gihiştibû destê wan. Lî mixabin, nêzîkî heş sal in, hêzen kurd ew mecal bi nezanîn û zanîn pûç kirin. Cur bi cur şerê hevdû kirin. Hêvî û daxwaziyên gelê xwe bi dolaran ve girêdan. Dolaran xwe parastin. Lî daxwaziyên gel wekî dolaran serf kirin. Qibla kurdan bû Bexda. Carna jî Enqere. Li Washingtonê û Dublinê, li Tehran û cihê din li dermanen çareserkirinê geriyan. Nedizanîn ku dermanê wan li Kurdistanê ye. Ne jî dizanîn. Lî belê berjewendiyen wân yê malbatî û sazî (bi piranî

partî) di ser berwejendiyen gel re bûn.

Bi rastî ev siyaset li gorî berjewendiyen sazî û malbaten wan jî nîn e. Lî em vê carê li ser vê mijarê nasekinîn. Mijara başûrê Kurdistanê mijareke dûvedirêj e. Em dixwazîn îro bi piranî lî ser armanca dewleta tirk bisekinîn. Di rojîn pêşîya me de jî, li ser hevalbenda wê PDK'ê. Yek: Gelo bi dagirkirina Başûr armanca dewleta tirk ci ye?

Du: Di dagirkiranê de berjewendiyen PDK'ê ci ne?

Sê: Di hevalbendiya dijminekî wekî dewleta tirk de berjewendiyen Kurdistanê ci ne? Em ê li bersiven van pirsiyaran bigerin.

Armanca dewleta tirk:

Têkbirîna şoreşa başûrê Kurdistanê. Eger pêşveçünê li Başûr çêbit, xerabkirina wê. Xeyala tîrkan a dîrokî ya li ser Kerkük û Musilê.

Eger desthilatiya kurdan çêbit, di navâ wê de pişkdariya tirkmenan. Ku herdem berjewendiyen tîrkan li Başûr bêne parastin. Wekî dagirkiranî girava Qibrîse û encamên wê.

Herdem bi leşkerî û siyasi wekî arîkariye nêzîkbûna hêzeke kurdan. Ku dijminahiyeke mîjuyî di nava kurdan de çêbit. Herdem ji kîmasî û nakokiyen kurdan istifade biketin. Ku kurd yekîtiyeke neteweyî çeneken.

Ew kes û sazî an jî dewleten arîkariya kurdan diken, bizanîn ku kurd tu caran nabin yet.

Ji ber ku çiyayen navbera Başûr û Bakur ji bo lojîstika gerîylan girîng e, da ku êrişen

xwe bi hêsanî biketin.

Ü bandora şoreşa bakurê Kurdistanê (PKK) li ser Başûr kêm biketin. Ew herêmîn li Başûr piştgiriya PKK diken, bêñ valakirin. Wekî Bakurê Kurdistanê.

Ü kurtiya wê, eger li Başûr desthilatiya kurdan pêk bêt, her gavekê bi gelek rengan ewê şopînîtin.

Wekî tê zanîn dewleta tirk naxwazit kurdibine xwedî dewlet, statûyeke neteweyî an jî sitatûyekeke navneteweyî. Di parvekirin û dagirkiranî Kurdistanê de ev daxwaziya xwe bi cih ïnaye. Di hemû serhildan û raperînê Kurdistanê de ev siyaseta xwe meşandiye. Carna bi siyasetê, caran jî bi top û tivingan. Carna bi komküjî û jenosid, carna jî bi koçberkirin û asîmîfasyonê. Carna bi politikayan, carna jî bi derewan. Ne tenê li bakur, li başûr her wiha rojhîlat û rojava Kurdistanê. Di hemû têkçûn û şikêstên kurdan de tiliya dewleta tirk heye. Ne tenê di Kurdistanê de, di warê navneteweyî de jî, asteng û kelemê herî mezîn e. Li ku derê saziyek an jî pêşveçünê ji bo kurdan baş bîtin, dewleta tirk dijmin e. Mirov û saziyên navneteweyî yê ku li ser çareserkirina kurd dixebeitin, ketina wan ya nava Tirkîyeyê qedexe ye.

Bi kûfî, dewleta tirk dijmina herî mezîn e ji bo kurd û kurdayetiye. Eriş û dagirkiranî Başûr tiştekî xwezayî ye. Lî berjewendiyen ïxanetê ci ne? Ew mijara ji bo careke din e.

Bayê çiya, bayê azadiyê ye


Di dirokê de kes gelên ku doza azadiyê kirine, bûne dildar û evîndarê çiyayan. Lewre çiya hêviya mirovan vedijînin û ji bo mirovan kozika herî asê ne. Ji bilî vê yekê jî, ji dostê xwe re dost in, ji neyarê xwe re jî dojeha herî xedar in. Çawa ku Spartakûs, Hz. Muhammed, Hz. Musa û Castro hêz û yekîtiya xwe di hembêza çiyan de pêk anîn. Welê jî gelê me, ev sê hezar sal in di navenda çiyayê xwe de, jiyan û hebûna xwe didomîne.

Dema ku dibêjin çiya, gelo ci tê bîra mirov? Berî her tiştî bêhna bayê azadiyê û bilindiya çiyayan. Ji ber ku çiya tim bûne hêlinâ parastina azadiyê. Di dirokê de kes û gelên ku doza azadiyê kirine, bûne dildar û evîndarê çiyayan. Lewre çiya hêviya mirovan vedijînin û ji bo mirovan kozika herî asê ne. Ji bilî vê yekê jî, ji dostê xwe re dost in, ji neyarê xwere jî dojeha herî xedar in. Çawa ku Spartakûs, Hz. Muhammed, Hz. Musa û Castro hêz û yekîtiya xwe di hembêza çiyan de pêk anîn. Welê jî gelê me, ev sê hezar şal in di navenda çiyayê xwe de, jiyan û hebûna xwe didomîne. Tu carî çiyayan xiyaneta li hemberî dostê xwe qebûl nekirine. Tim serê wan bilind e û tu carî sernizmiyê qebûl nakin.

Gelo çîma dema gelek dikeve astengiyê, hema xwe dispêre çiyayan? Sedema wê jî ew e ku, çiya kozikên herî asê û dijwar in. Ji milê din ve çiya tu carî vîn û mîjiyê mirovan dîl nagirin. Ji wê pirtir hemû riyêñ azadiyê nişanî dostê xwe didin. Lewre ji xwe pirtir, dilsoz û bendewarê dostê xwe ne.

Ji bo mirovên ku wateya çiya nas bikin û rista wan bizanibin, çiya hêza herî bikêr û xurt in. Gelê ku çiya ji xwe re kirine war, heyânî roja me ya iroyîn hebûna xwe domandine. Mîna gelê kurd, di gel ku evqas tevkujî û hovîtî li ser hatiye meşandin, dîsa jî dijminan nikaribûne wan ji holê rakin. Wekî împaratoriyyen aşûr, pers, İskender, roma, erek, tîrkan û hwd. Lî ev xebat û hewla van împaratoriyan bi kîr nehat. Ji ber ku gelê me bûbû hevalê çiyayê xwe. Çiyayan jî hembêza xwe mîna dayikan jê re vedikirin.

Ciyayê dilsoj, fedekar û qedîrnas xwe li gelê me dipêçin û ji tevahîya êrîşê zaliman diparêzin. Bi wê berfa xwe ya spî ya Sîpanê Xelatê û Agîrî, bi ava xwe ya sérîn û zelal, mîna sîrê dayikan (ava Zapê, Dîjle, Munzur, Ferat û Botan) bi wan nîmetên xwe yên cur bi cur, bi delalî gelê xwe têr dikin. Bi



bêhna gul, sosin û beybûnan, bi hewaya xwe ya paqîj û delal xweşîyeke di din mirovan. Ji mirovan re dibin heval û hogir, dibin dermanê êş û elemê, dibin hekîmê birînan. Li serê zinarê çiyayê asê, wekî zinarê Herekol, Cîlo, Nemrûd û Sîpanê, raserî gola Nazokê, li hemberî Gola Wanê ji wan re hêlinê wekî hêlinâ teyrê Simir çedîkin û wan dihewînin.

Her çiqas dagirkaran welatê kurdan xistibin bin destê xwe jî, kurd teslim nebûne, xwe spartine serê çiyayê asê û bilind. Kurd her çiqas ku ji siyaset û ji şaristaniyê dûr mabin jî, dîsa çand, ziman û orf û adetê xwe parastine. Li serê wan çiyayê delal, nêzî hîv û rojê, cîranê stêrkan, di nav teyr û tûyan, xe-

zalan, sêr û pilingan de, bi camêrî û bi rûmet jiyane.

Bêguman ne ji wan çiya bûya, wê gelê kurd an teslim bibûya an jî wê di bin lingê hespê neyarân de bipercîqiya û tune bibûya. Wekî ku ûrartû, asûrî û babîlî ji holê rabûn. Li aliye din kurdên ku li deştan man, her çiqas kelehen wekî Keleha Amedê, Keleha Dimdimê û Farqînê ava kiribin jî, dîsa jî nekarîn xwe li ber êrîşê zaliman rabigirin. Ew kurdên ku li deşte mabûn an hatin qırıkin an teslimbûn an jî hatin pişafatîn. Ji taybetiyê xwe yên neteweyî dûr ketin, bûne kole û xulamê kedxwaran.

Ji bo vê yekê tim kurd bi çiya ve hatine girêdan û çiya jî bûne dostê herî mezîn yên kurdan. Ji ber, vê qasê

kurd û çiya bûne yek, wekî goşt û hestî tu caran ji hev neqetiyanê û naqetin. Dema dibêjin kurd çiya, dema dibêjin çiya jî kurd têne bîra mirov.

Em dînihîrin, gelê kurd hingî ku hez ji çiyan kiriye, di pîrî helbest, stran û destanên xwe de behsa çiyan kiriye. Dîsa evîndarar berê xwe dane serê çiyayan. Çawa ku Siyabend û Xecê berê xwe dane Sîpanê Xelatê û rizgariya xwe di wir de dîtine, kurdan jî dema ku xwestine li dijî neyarân şer bikin, berê xwe dane serê çiyayan. Mîna Şêx Seîdê kal, Seyîd Rizayê delal, Îhsan Nurîyê evîndar û Egîdê Egîdan, rîber û lehengê şerê azadiyê Mahsum Korkmaz jî bi gerflayê azadiyê re li şer çiyayê Kurdistanê dest bi şer kiriye.

Lewre her tiştîk (giya, dar û hwd.) li şer rehê xwe şîn dibe. Masî jî di nav behrê û avê de jîndar dimîne. Mirov jî bes dikare di nav xwezayê de, ku cihê destpêka mirovahiyê ye, xwe nas bike.

Her wiha di roja iro de, gerîlayê şoreşa azadiyê jî, heke ku ne di çiyayê Kurdistanê de şer bikiranâ, wê nikaribûna li dijî neyarê xwe yê bi hêz û xwedî dewlet xwe rabigirtana. Di demeke kurt de dê bihatana tuñe-kin.

Gerîlayê azadiyê, wekî şêrên kurdan ên berê tenê li çiyayekî ango li heremekê şer nakin, li tevahîya çiya, deşt, zozan û newalê Kurdistanê şer dikin. Wan çiyayê Kurdistanê ji Dêrsimê, Agîrî, Andokê bigire heya Zagrosan û her çar aliyê Kurdistanê li dijmin kirin dojeh û bi lehengîyekî mezin, li her deverê, tehtekî û li bin her darê xwîna xwe ya sor rijandin.

Bi kurtayî ji dirokê heya vê gavê gelê kurd her dem rizgarî û azadiya xwe di çiyayen de dîtiye. Di roja iro de jî, ev rewş tê meşandin. Dîsa jî keç û xor-tê Kurdistanê azadiya gelê kurd di çiyayen de dibînin, çiyayen jî xwe re dikin stargeh û li dijminê xwe dikin dojeh.

H. MEHMET KORHAN

□ Rezber 1992:
**Nûçegihanê Özgür Gündemê Hafiz Akdemir
 hate kuştin**

Nûçegihanê rojnameya Yeni Ülke û Ö. Gündemê Hafiz Akdemir ji aliye kontrayan ve hate kuştin. Hafiz Akdemir bi nivîsên xwe bala dewletê kışandibû ser xwe. Gelek caran nivîs û lêkolînên wî yên li ser karê kirêt ku ji aliye dewletê dihatin kîrin, hatin weşandin. Akdemir, di sala 1984'an de ji doza KUK'ê hatibû girtin û li Girtîgehîn Amedê, Eskişehir û Uşakê mabû. Lî pişî van yekan Hafiz Akdemir ji doza PKK'ye hatiye darizandin.



□ 06 Rezber 1913:

**Kovara bi kurdi û tirkî ROJÎ KURD bi dest
 weşana xwe kir**

Kovara ROJÎ KURD bi kurdi (kurmançî, soranî) û bi zimanê Tirkî di 06.6.1913'an de dest bi weşana xwe kir. Xwediyê vê kovarê Edilkerimê Silêmanî bû. Hejmara kovarê ya yekemîn li Çapxaneya Hiquqê/Hukuk Matbaası hatiye çapkîrin. Kovar bi tenê sê hejmaran hatiye weşandin. Lî gorî hin çavkaniyê din 4 hejmarên kovarê derketine. Dîroka çapa hejmara çaremin jî 30.7.1913 tê nişandayin.

Bi bandrola dewletê filmekî bi kurdi: **Mesîh îsa li kurdi hate wergerandin**

Berî niha bi demeke kurt bi sa-zûmankariya Weşanê Müjde filmek li ser jiyan û felsefeyâ Mesîh îsa bo kurdi hate wergerandin. Tiştê balkêş ew e ku film ji Wezareta Çandê ya Tirkîyeyê bandrol wergirtiye. Filmê navborî ji aliye derhênerê navdar John Heyman ve hatiye dirustkirin. Di dîroka Tirkîyeyê de pişti filmê Mem û Zîn, ew filmê duyemîn e ku li kurdi tê wergerandin. Lî Mem û Zîn her çiqas bi tirkî bandrol wergirtibû jî, bi kurdi bandrol wernegirtibû. Jixwe dema Mem û Zîn di televîzyonan de hatibû nîşan dan, raya giştî ya Tirkîyeyê geleki tenezar bûbû. Digotin, xêr e gelo kurdan şoreş pêk anîye? Ew jî tevi ku bi tenê strana "Bîngol Şewîti" bi kurdi dihate gotin. Li aliye din ev filmê dawîn ê ku li ser jiyana Mesîh îsa hatiye dirustkirin, bi tevahî bi kurdi ye. Berpirsyarêن Weşanê Müjde diyar dîkin ku, wan bi hêsanî bandrol wernegirtiye û geleki zehmetî kışandine. Ji vê yekê diyar e ku, ji niha û pê de wê ev film bibe mijara nîqaşan. Pişti ku hate weşandin jî Xwedê zane!

Derhênerê film John Heyman heتا niha gelek xelat wergirtine. Wî bi vî filmê xwe xwestiyê ku, Filîstîna sedsala yekemîn nîşan bide. Vê yekê berê wî daye sér jiyana Mesîh îsa.

Derhêner Heyman pişti xebate ke dûvedirêj, ev berhemâ ku li ser rastiya jiyana îsa ye afîrand û pêşkêşî hemû dînyayê kir. Senaryoya filmê Mesîh îsa ji beşa Lûqa ya ku di Încîlê de cih digire, hatiye wergirtin. Di Lûqa yê de ci hatibe gotin, di film de jî ew hatiye raberkirin. Filmê îsa ji hemû filmên ku heta niha hatine duristkirin, bêhtir li zimanân hatiye wergerandin û ji hemûyan zêdetir jî lê hatiye temaşekirin. Niha jî ji bo gelek zimanên din xebatên dublajê didomin. Ji van ê herî dawî ev dûblaja ji bo zimanê kurdi ye. Film rengîn e û 120 deqîşeyan didome. Film li gorî naveroka Încîlê li ser xaka Filîstînê hatiye duristkirin. Di film de tam pênc hezar îsraîlî û ereb rol digirin.




Belê ev film li Tirkîyeyê yekemî filmê bi kurdi ye ku bi awayekî fermî tê pejirandin. Dewleta ku heta niha zimanê kurdi bi qanûnên xwe qedexe kiriye, iro filmên ku li kurdi hatiye wergerandin dipejirîne. Ev helwest bîvê nevê hin tiştîn din tîne bîra mirov. Gelo wê dewleta tirk di vê pêvajoya girîng de, vî filmî li dînyayê wekî kozekî bi kar bîne? Li aliye din wergera filmekî ku li kurdi hatiye wergerandin, bandora xwe li her cihi nîşan dide. Gelek kes ji ber vê biryare tu dibê qey li sing û dasan ketine. Lî li aliye din jî tê ragihandin ku, wê destûra wergera filmên din jî bê dayin. Eger bê dayin wê dewlet filmên ku bi kurdi hatine kışandin jî bipejirîne an na?

AZAD ALTUN

ÇAVDÊRÎ

Li welatê me du
 aliyeen dijber



MÎRHEM YÎĞIT

E vê zêdeyi hefteyekê ye ku sêpleke mezin ketiye ser stûdyoya televîzyona Med li Stokholmê. Xirîteqetî û tempoyeke ne mîna her car û geleki berbiçav tê dîtin. Kurd-tên û dicin. Di nav wan de ji her aliye Kurdistanê siyasetmedar, rewşenbir, jîn û mîr, kal û xort hene.

Doh (31.05.1998) saat 11.00'ê berî nîvro paneleke rewşenbiran hebû. Panelê çend saetan dirêj kir. Programa panelê qedîya ne qedîya amadehîyen din dest pê kirin. Vê carê jî ji bo programê Kursiya Gel giş ev program û beşek jî ji yên rojîn buhuî li ser şerî Başûr û xiyane ta PDK'ê bûn. Belê wek gêrikan mirov dihatin û dicün. Li aliyeen mîvanen studyo û li aliye din kameraman, karker û xebatkarên Studyo. Em çendek jî ji bo dublaja rîzezîlmekî belgeyi li wir bûn. Di nav programan de imkan çedibû em li ser rewşa Kurdistan û Tirkîyeyê bi nîvîskar û zanayê kurd re ku di nay wan de kesen mîna Dr. Huseynê Xeliqi, Huseyn Kurdnijad, Refîq Sabir, Ehmed Skenderî, Mustefa Xoxê, Mele Emer, Seid Kwêstanî û hin xorten mîna Zerdeşt û Kiyûmers ku ji bajarekî çendse kilometre dûr hatibûn, sohbetê bikin.

Tirkîye di nav krîz û petaxeke mezini de ye. Her roj û her kîlî hinekî din noq dibe, hinekî din diçe xwarê. Sola di lingên wê de tengtir û dora lê tê hev qalintîr û qalintîr dibe. Ne bi tenê şev belê roj jî lê geriyaye. Bûye wekî marê birîndar û nîvîkuşî, li vî alî û li aliye din dikeve. Teperek û kukufa wê ye. Zêde ne bi hiş û ne bi şîur e. Ci, çima û ji ber ci dike, ev kîrîn dê bi xwe re ci-bîne, qencî û xerabiya wê çend e, zêde nema ji hev derdixe, hew rî dibe ser. Büyera Akin Birdal, dirindeyî û êrîşen her alî li hundir çetetî û dewleta nexweyî ew çendî pêş û ew çendî kontrola hikûmeta nebûye dabaşa şik û nîqaşê. Li derive jî ne xêr e, ji Tirkîye re Konferansên li Rojhilata Navîn ên mîna li Qahîre û Lubnanê, bîryara-mecîsa Fransaya ku qirkirina ermeniyen bi resmî qebûl-kir, her yek bi serê xwe ji bo siyasetmedar û desthelatdarên tirk kulmiskeke nuh e, ikazke cîdî ye.

Ketina başûrê Kurdistanê jî ne nîşan û delîlên xurtiya dewleta tirk berevajî îspata şikestina wê li Bakur û mirina hevkarê wê PDK li Başûr e. Dagîrkerî û kolonyalîzma tirk bi cehşîtî û xîyaneta li Bakur û li Başûr re sînorên nav her du parçeyen welatê me radike û dibe faktorekî handar ji bo yekîtiya ma li vî alî û wî aliye din. Ev rastîyek e.

Rastîya din rewşa PDK ye. Hevkariya PDK û cihgirtina wê di nav cepheya dijmin de bi taybetî di salê dawî de ew damara ku hinekî neteweyî bû û ew prostentê biçük jî ku bêhna neteweyetê jê dihat dawerivand û ew jî xwar. PDK niha maye hêzeke rût û tazî, heşkere û vekîri serbidijmin û di xizmeta dagîrkeran de.

Xîlafa PDK ji zû de jî xîlafa nav PDK û şoreşa Bakur derketiye. Büye xîlaf û dijayedîya nav PDK û giş gelê kurd. Gelê kurd, yekîtiya tirk e, PDK ligel e, pê re ye û bi xwe artêşa tirk dawet dike. Gelê kurd yekîtiye û Kongreya Neteweyî dixwaze, PDK ji bo ev yekîti li paş bikeve û Kongre bi sernekeve ci ji dest tê teqşîr nake. Gelê kurd li Bakur, li Başûr û li parçeyen mayî li dijî şerî xwebixwetîye ye û şerî navxwe ye, lê PDK çendî dikare vî şerî han dide. Rêxistin û hêzeke ew çendî xwedîlîxistî, ew çendî jîrêderketî û xezbelêhatî ne mimkûn-e mirov karibe li welatê din bibîne. Nîmûneyeke wiha ince dikare şahberhemê civata me be. Belê li welatê me aliye din jî hîye. Aliye neteweyî, hemdem û Kurdistanê, berevajî PDK ku ew ji Pekekeyetî ye. Ya ku büye hêviya her kurdi jî ev e.

Ji bexçeyê Şehîdên Ku Gula Şehîdan Nalîn Hisso

Werger û amadekirin: HELİM YÜSİV

Nalîn Hisso yek ji pakrewan û bengiyêñ Welatê Rojê û azadiyê ye. Ew ji zanîngehê berê xwe dide çiyayêñ Kurdistanê. Malbata wê, ji ber zilma Roma Reş berê xwe daye Binxetê. Bavê Nalînê digel Cigerxwîn, Osman Sebîrî û Nureddîn Zaza kevaltî kiriye û ew bi xwe jî helbestan dirêse. Di vê nivîsa ku nivîskarê me Helîm Yûsiv amade kiriye de, hûn dê fêrî jînenîgariya Nalînê bibin û nameya wê ya ku ji malbata xwe nivîsiye bixwînin. Her wiha helbesta ku bavê Nalînê bo wê nivîsiye jî, hûn ê bixwînin.

Nalîn di sala 1972'yan de, li Qamışloyê ji dayik bûye. Xwendîna xwe heta lîseyê li Qamışloyê kuta kir û li Zanîngeha Helebê Beşa Endeziyariya Elektrikê tomor kir. Lê Nalîna ku li ser evîna welêt û hezkirina jiyanekî bi rûmet mezin bûbû û xewna azadiyê bi şîrê diya xwe re vexwaribû, nema karîbû vê jiyanâ "normal" bipejirîne. Dema xortek tê wê dixwaze, dike wekî qelen 350 hezar diravêñ sûrî û ser de jî 150 hezarî bide bavê wê. Lê tu carî pere û zér, jiyanâ bindestî û "metbexan" çavêñ Nalîna xweşik danagirin. Çavêñ wê li dûr dinihêrîn û doza welitekî serbixe, û milettekî azad zora her tişî dibe. Bi hêstirêñ diya xwe re biryara bêveger di: "An Kurdistan an jî ez ê binax bîbim!" Lê Nalîn nebû dîla, binaxkirinê wekî her mirî yî. Nalîn wê di dilan de tim şewq bide, her û her bilind bibe û xełeka ronahiyê firehtir bike.....

Wê rojê ez û hevalê xwe Konê Reş, em li mala bavê Nalînê bûbûn mîvan. Diya Nalînê neviya Silêmanê Mistê ye. Silêmanê Mistê ji Mala Dîbo û axayê eşîra Elikan bû, ku li derdora Batmanê bi cih bûye û welatparêz e. Diya Nalîn wîlo digot: "Ji 34 gundan, 10-12 gund ji ber destêñ tîrkan filitîne. Èdî wîsa bûye şewat û xerakirina ku dijmin bi ser serê me de dibarîne bêhempa ye" Dayîka serbilind li ser Nalîna xwe ya jîr jî wîlo digot: "Xweska min rojekê tenê ew ji xew hişyar kiribûya..."

Belê. Nalînê pir dixwend. Dema ku xelk tev de di xewa şerîn de windayî bû, Nalîn hişyar bû û çavêñ wê yê spêhî li benda hilhatina rojê bûn. Bavê Nalînê digot: "Kesek tunebû ku ji Nalînê hez-



JI DEVÊ BAVÊ NALÎN YÊ HELBESTVAN

*Şîr im, dixuricim can xelat im
Perwane me, li dor arê felat im
Karker im, tim li kar im, ez roj û
şev
bêheden im, wek Dîcle û Ferat im
Ez cinî me, li her warî diyar im
Dêwe sôr im, li pozê Ararat im
Ez pilingê daristan û çiya me
Ne tenê me, bi kom û civat im
Ji nav mij û dûmanê derketim jor
Rengê roka rûgeş va me hilat im
Dirêsim her li ser xaka Kurdistan
Teyrê baz im, li Sîpanê Xelat im
Dinalim ez ji derdê xwefiroşan
Lê nahejim rengê zinar û lat im
Ez Nalîn im, çira şîrê spî me
We şepalim dil û ceger polat im
Nala xewla serî qet natewînim*

*Di zîndanê neyar de keferat im
Ez sozdar im, bi Rênas û Ciwan re
Keça Kawa neviya Keykubat im
Mîna Zîlan li neyaran bi kîn im
Ez volqan im, tev de ar' û şewat im
Ji bo kesê bindest hatime şandin
Pêxember im, bi İncîl û Tevrat im
Ne Candark û Cemîla Li Cezayîr
Ez hîn bêtir ji wan zêde dugat im
Mîna xamê li ser namê dilizim
Ji kongra jîna kurd re pêk hatim
Min kemînê neyaran tev şikandîn
Gazî kirin firokan ez hingavtim
Qomîtana gerîla me, li Cûdî
Nemîrî me, ez şehîda wîlat im
Li te teng bû zû bik qêrîn û hawar
Bê ya Nalîn tê binêre ez hatim*

nedikir" Bavê Nalînê "xor текî" temen mezin, helbestvanekî kevnar e, hevalê Osman Sebîrî, Nûredîn Zaza û Cegerxwîn e. Serpêhatiyê hepsê û yên rojê azar û kezebreşiyê li ber me raxistin û bi xwendina helbesten xwe re hestgerm û diltenik dibû. Di nav destêñ wî de li dora sê dîwanê neçapkirî hene û di vê nivîsê de hûn ê helbesta wî ya li ser keça wî ya şehîd bixwînin. Min ji diya Nalîn pîrsî: "Çend zarokêñ we hene?" bersiv da û got: "Sêzdeh. Heft law û şes keç. Nalîn ya çaran e" Wê wekî hemû dayîkîn kurd ên dilpak û hestenik ji bîr nedikir ku êşa kurdan bêşînor e û ev şerî navxweyî (şerî birakujî) bêhtir vê êşî fireh û mezin dike. Diya delal berdewam dikir: "Wê rojê çend xort ji çiyê daktebûn. Ji Başûr hatibûn, ez cûm cem wan. Lê gava yekî ji wan qala kuştina çar xor-tên pêşmerge kir û got, her çar jî xwendevan bûn ku ji bo nanê xwe bûne şer-van. Wan got mecbûrî ye (li gorî wan) lê tev wilô jî me ew kuştin. Ji hêrsa xwe edî min nikaribû li rûyê wî binihêriyam. Tevî ku digot, ew jî wilô me dikujin. Lê agir ketibû nava min lawo! Ji ber ku min kezeba xwe li ser kiriye û ez dizanîm dayîkîn wan xortan jî li benda wan in. Erê lawo! Dijminaşî bêminetî ye. Lê gava kurd kurdan dikujin bi Xwedê erd û ez-man diheje.."

Agirê jiyanê dada

Navê Nalînê bûbû derya ku hemû çemîn peyvan ber bi xwe ve dikişandin. Di sala 1990'ı de ketibû nava germahiya xebatê û di nav gel de ronahî dida. Xort hişyar dikirin. Berê keçan bi serbilindâhiyê vedikir. Agirê jiyanekî nû li her dêrê dadida. Berê gelekan ji wan dida çiya-yêñ Welêt yêñ ku di dilê wê de cih girtibûn. Hêdî hêdî dibû stérkeke ges û di nav tarî û reşahiya dágirkirinê de diçirîsî. Di sala 1993'yan de Nalînê nameya xwe nivîsand û berê xwe da xewna mezin û şerîn ya ku her şîpek ji navê wê bi hezaran mirovan jê re bûne qurban.

Ji ber ku bi zimanê erebî hatibû nivîsandîn, min nameya wê ji destê diya wê girt û bo zimanê kurdi wergerand. Pey-vîn Nalîn, nîşana xwesîkbûna wê ne ku berî her tişî ji rastî û dilsoziyê tê. Ka çawa ramanêñ mirov û karê wê li gorî hev in. Ji ber ku em di demeke wîlo de ne ku, her kes dibe durû û deh rû û tiştekî dibêje û berevajî wî tişî dike. Nalîn wekî ni-mûne, bersiveke hêja ye û her wiha xemgîn û bi êş e jî.....

Bi vî awayî, bi vê dilê germ, di sala 1995'an de, Nalîna ciwan mîna gulekê ges, bexçeyê şehîden welatê xwe xemi-

distanê, Guleke Ciwan:

"Xwediyên Cîhanê" kenê ji ser lêvên zarokan didizin. Zarokên dê ji dest direvînin. Sînoran di nav bira û bira de datînin. Evîndaran ji hev dûr dixin û gunehênu pênûs nikare binivîsîne dikan. Lê çiqas jîr bin jî, di bikaranîna guneh û tawanbariyê de, wê dîrok xwe vegerîne. Û ji kûrahiya vê ketinê û van azaran em ê şoreşê biafirînin.

NAMEYA NALÎNÊ

Ji bo malbata welatparêz û dilsoz,
Ji bo gelê Kurdistanê....!

Tîstê ku ez dixwazim di van rûpelan de binivîsinim, ne nameyeke ku keçek dixwaze ji malbata xwe re bi ré bike. Lé ew bi xwe qerînek e, ku di riya wê re ez dixwazim banga Partiya Karkerênu Kurdistanê (PKK) bigihînim tevahîya cihanê. Da ku mirovayefi bi vî gelê jibîrbûyî bihese. Erê! Edî dîrok jî nema dikare salênu bindestiya me bîhêjmere, koletiyê dirêjkariye hetanî ku em nema bi koletiyâ xwe hest bibin. Ne ji ber ku em azad in lê belê ji ber ku me xwesiya wê azadiyê nedîtiye. Ya ku karibe taliya koletiyê bi me bide naskirin. Li ber rojeveke wilo bêdil û hov, gelo keça Kurdistanî dikare ci bike? Bi ci çekâ wê bi vê rojeve re têkeve şer? Ew e ya ku civakê yan ji Xwedî (li gorî bawermendan) ji her çekî bêpar hîstiye. Ka wê çawa şerê koletiyê bike? Ew bi xwe heta qirikê di nav koletiyê de dijî.

Agir mirov distawîne

Dema ku naskirina min bi Partiyê re dest pê kir, min nas kir ku ew wêneyê ku xelkê daniye, şas e û dûri gotin û axafînîn wan e. Min bawer kir ku, ew ne partiyek û rîexistin e yan ji peyvek ji van peyvan e. Partiya Karkerênu Kurdistanê di hundirê xwe de, di rastiya xwe de jiyanekî nû ye, sistemeke nû ye, kesayetiyen nû ne. Têkiliya min ya bi Partiyê re, berî her tişî ez bi ser koletiyâ mirovî me ve kîrim. Ew bi xwe koleyê dijmin, civak, zagon û durûbûn û koleyê her tişî ye. Heta koleyê xwe ye ji. Wi tu tişî bi dest nexistiye. Ev koletiyâ ku însanîn me té de dijîn, jîna Kurdistanî duqat bi reşahiyeke tarîtit, bi nezaniyeke bêsînor û bi serîdaxistîneke seyrî té de dijî. Jîxwe ez nikarim bibejîm ku min jiyanekî alternatif pêk anîye. Lé ez vê koletiyê red dikim. Li gel ku ez hîna nikarim rengê kesayetiyâ mirovî azad û bi taybetî jîna azad bidim xuyakirin. Lé ez gîham vê bawerîye ku Partiya Karkerênu Kurdistanê ji bo wê jiyanâ ku ez lê dîgerim, xebatê dike. Tevî ku ew ji hîna negîhaye wê jiyanê. Jîxwe xwesî û talbûna şoreşerîye ji ev e. Divê kesen şoreşerîye beşdarî vê xebatê bibin. Ji ber ku kesayetiyâ azad bêyî ku li ser agirê van eşan bistewe, nayê avakîrin. Karê di ber qezencirkirina azadiyê de, bi xwe kesayetiyâ şoreşerîye azad diafîrîne. Lé binaykirina encam û forma wê azadiyê, di nîrîna min de, ji nîrxê azadiyê dadixîne û zirarê dighîne rûmetâ azadiyê. Erê... Ew em in, ku li vê cîhana ku her tişî nézîki xwesîkbûnê xera dike, em li xwesîkbûnê dîgerim. "Xwedîyên Cîhanê" bi xwe, ji bo şewitandin û hilwesandina wê kar dikan. Kenê ji ser lêvên zarokan didizin. Zarokên dê ji dest direvînin. Sînoran di nav bira û bira de dañînin. Evîndaran ji hev dûr dixin û gunehênu pênûs nikare binivîsîne, dikan. Lê çiqas jîr bin jî, di bikaranîna guneh û tawanbariyê de, wê dîrok xwe vegerîne. Û ji kûrahiya vê ketinê û van azaran em ê şoreşê biafirînin.

de, wê dîrok xwe vegerîne. Û ji kûrahiya vê ketinê û van azaran em ê şoreşê biafirînin. İro, dîrokê barê mirovahîye bi tevahî avetiye ser milênu me, piştî ku em ji her kesi bêhîr li paş vê serdemê mabûn.

Rojeva Kurdistanê, bi hemû eş û taliya xwe, büye malzaroka hilgirtina serokên mezin. Erê... Bi vî awayî em vê serdemâ xwe fêm dikan. Ji bo tiştekî mezintir em tişîn mezin dikan qurban, em jiyanâ normal dikan qurbanja jiyanekî şoreşerîye ya bi rû-

ziya hîviyên zârakatiye di gîhiştina xwesîyê de, hîviyên gel di gîhiştina azadîyê de û hîviyên evîndaran di dîtinê de em nekin. Girêdana me bi van hemû hîviyên bi rûmet re dihêle ku, em bibin xwediyê kesayetiyekî serbixwe.

Di dîrokê de ev cara yekemîn e ku, keç fîri qezencirkirina vê kesayetiyekî ya ku ji roja roj de cêri bû, ku biryar jê nedîhat xwestin, bicîhanîna biryaran jê dihat xwestin. Ji berê ve civak ji keçê re bend e. Ne zagon û

karekî zehmet dike da ku jîneke nû û azad derkeve holê.

Ez heta dawiyê kîfîxwes im ku ev keys bi dest min ketiye ku, Serokatiya Partiyê min ji nêzîk ve naş kir û dersê şoreşerîye min li dibistana bi rûmet standin. Lê li alîyê din ez pê dihesim ku, heta niha em ne gîhiştine wê kesayetiyâ ku dîrok û Serok ji me dixwaze. Lê hîna peyvîn Serok li ber guhêni min deng didin. Ez ê bi hemû héza xwe kar bikim, ji bo afîrandina îmkanen nû da ku ez karibim bersiva keda Serokatiyê bidim. Bi bawerîyeke wilo xurt, a niha em berê xwe didim Qada Botanê ya têr rûmet. Ew bi huşa ku bi serdeman dijmin em ji ditina wê û ji bêhna wê ya xwes dûr xistine.

Em berê xwe didin Botanê. Cihê bêhna gulan ya ku tev li bêhna barûdê dibe. Liben xunavê bi xwînê rengîni dîbin. Mi ja sibeha spehî ya ku dijmin bi dûmana bombebarandinê gemar dike. Ez berê xwe didim Welêt. Ne tenê bi dû xewnen me yên spî de dimeşim, lê têgîhiştineke li hemberî reşahiya ku li wê meydânî bi cih kîrine. Ez berê xwe didim jiyanâ gerîla. Ji ber ku ew meydân bi hewceyi keç û lawen xwe ye, bang li wan dike, da ku ji jiyanâ keysbazîyê rizgar bibin. Botan cihê ku welatparêziya xwerû û dûri gemara dijmin ku di eyî demê de dûri şaristaniyê maye. Gava ku em rûmeta vê jiyanê nas bikin û pê nelîzin, erê... em dikarin li vir karêne mezin bikin, dema em li rastiya Partiyê û Serok xwedî derkeyin. Nexwe ji bîli xîyaneta gel, Partî, Serok û dîrokê em nikarin tiştekî bikin. Dawî zanîbin! Em dana we hîc jîbîr nakan. Welatparêzî û dilsoziya ku me ji we girtiye, wê tim me bi pêş de bajon. Hezkirina me ji were bilintir û bi rûmetir e, ji wê jiyanâ normal a ku dibe ku me bike zârakên bas ji we tenê re. Lê ji me té xwestin ku em zârakên bas bin, ji tevahîya Welêt û mirovahîye re.

Bavê min ê birêz!

Ez mezinahiya te, welatparêziya te û dilsoziya te ji bîr nakan. Ez ê kar bikim ji bo ku ez bibim keçekî delal û hêjayî mezinahiya te, ku tu pê serbilind bîbi. Ji ber ku ez keça te me.

Diya min a birêz!

Ez dilpakî û hestîn te yên germ, dilê te ji bîr nakan. Ji bo te û ji bo hemû jînîn Kurdistanê yên wekî te ku "kezeba" xwe kîrine qurban, heta dawî ez ê kar bikim.

Xwişk û birayê min!

Ez ê kar bikim da ku hûn ji min razî bin. Divê hûn ji kar bikin ku, ez ji we razî bin. Li her meydana ku hûn lê bin, kesen bi nîrx bin, ji ber ku em ji bo tevahîya mirovahîye kar dikan. Silavên germ ji bo hemû welatparêzî xwedî şeref. Ji bo her kesê ku, saeteke tenê be ji temenê xwe di ber mirovahîye de dixebeitine.

Xewnek ji bejna sînoran

Ho Karwanooo....

Ma ev ci xebexeba bêbexte e, bêwexte e, ji daw û dêlén te difûre? Ev ci bazdan e, serê tiliya te ya qeraqûçikê, bi xweliya temenê te hine dike? Ci govenda penaberiyê ye, li ber çira kaniya toz û rimilka wê, şitlên êşen te aj didin? Va ne dan ser serê te. Ev keştiya gewre ku li ser simûcikê te siwar û te di na-va derya xemên min ên mirdar de, dike rêuwing. Tu, berzûrî kevirê goristana vî dili dibê. Ev dil, li ber agirê temenekî xemrevîn. Xemrevîn, bazikêñ mizgîn-xêra miradê te yê qurmiçî seqa dike.

Ho Karwanooo.... qirktaliya min ji ber korelehiya giriye wan tiliyên serse-witê, ku ji bêrika qul, ya ji temenê te yê ji xweliyê maye ketiye û mane bi tenê, li şunewarêñ ku kuliyan guliyêñ wê ji wê re kirine kindira sêdarê. Û awirêñ çavan, di koncalêñ ku paniyên te yên pêxwas li dû xwe hiştine de dixeniqin.

Karwano! Qirktaliya min ji wê axa di agirê çavêñ qimil û mirmirkan de dibiriye, ku zimanê min, di hungura her berbangêñ reşbîn de, serê xwe bi ren-gên wê diço.

Lo Karwanooo...

Mexape bi cepikêñ ji bo firêñ te ser-nîşîv dike, ser û rûyê hev radimûsin û devêñ, navê te bi qûş û palûma li ser pişta temenê té girêdidin: "Kewê Ribat, Kewê Gozel" Ew xapêñ te bi lingêñ te vedidin, Karwano... û bazikêñ te bi gi-raniya xweliya xapêñ te ditewînin. Na Karwano. Xapan nekole, xap xapînok in.

Ew parzemînê di pişt çiya û derya-yêñ xewnêñ te de raketî, ji bişirînêñ xwe qeydan ji bazikêñ te re çêdikin. Erê. Li wan taristanan, koristanan kew nabin baz, nadin perwaz. Xewn guneh in Karwano, li wan peravan, qesageh dilê xwe bi xewnêñ xam û germ, ên ke-

wêñ kewîstanê germ dike. Xewnan dixwin Karwano, xewn dimirin, xewn bi sînor dîbin. Keştiya kulmoz û moz-qirtikêñ yekbûyî, dê berê eniya te bide eniya mayinê Global. Hevrîsimê hile-baz, dê li ser zimanê te teşîya xwe birêse. Lingêñ te dexes in, pêgirêñ mozan in. Di awirêñ te de bombe çandine û li ser pozê wan bombeyan wêneyê mirina te çêdikin, bi nepenî.


Bi ser dilê xwe de daqûl dibe, hilalik û guhîj, bi diriyê hesinî nikulêñ xwe di serê çarenûsa te de dadiçikîn, nikul-sor in ji xwîna temenê te. Karwano! Berbendîxano... Li eniya xwe binihêre, sînorêñ tu jê direvî, hêlinâ xwe di eniya te de çêkirine, ji perperikêñ gulberfinâ bi rimêñ awirêñ te hatiye kuştin, ya dû-veroja te, Karwano, reva ji sînoran reva ji hêstirêñ xewna dayikê ye. Diranêñ sînoran serê çira şîr di pêşîrêñ dayika min de jêkirin û min û te, ji wê pêşîra quşandî, çîren serîjekirî vedixwarin.

Ma nayê bîra te? Min û te ji terhêñ zeytûnêñ xabê rim çêdikirin, li keviya termê Dêrikê û me gewdê sînoran di-dan ber tîran. Paşê me di goristana Kaliko de, laşê sînoran ditemirandin.

Vegere Karwanooo... Li sînorîstanê, çiyan pêçekêñ qeydkirî tev cirandin. Termê landikêñ ji pirça rûreşıya dîrokê, li lûtkeyan bi ser sînoran û ev hîmê ji kulmoza mozan re stare de gêr dibe. Giraniya jehra wan, bûye bela serê wan, Karwano.

Li lûtkeyan zinarêñ xewnê vedijin, asoyêñ xencerkirî birînêñ xwe dikewînîn, serxwînik di rimilka gorêñ xwe de, kenê rojê diçin. Tiving, li koristanê sirûda dojehî ji sînoran re dixwînîn û axa xewnêñ min fî dîl rûyê xwe yê bi rimilk li ber şîpa hêstirêñ Zapê diço.

H. KOVAN BAQI



Ey birîn!
mebestay te ya dev ji min berdanê heye qey
tu polûpotê xwe hêdî hêdî dişidînîn.
me evîn kir qultek jehr
û di şevêñ qemer de
me bi ser zengîlolkêñ xwe de dakir
li lûtkeyan bazan çelik derxistin
elat dike bi firê bikevin

belengazî.
li navê te yê dîrokî nake
birovek be
û peq bi peq li canê min belav bibe
hesbê birîna em bi hev re bibînîn
hê gelek in
cihê tu yê tê de cîwar bibî
ez nexweşê te
bi nalîn ji te re vebêjim;
serê neynûkan
binê gurçikan
û ilim ji hundirê hestiyân!..

BIRÎN

min himbêz vekiriye,
guroloq bi ber min de bibeze
tu û hemû wersiyonêñ te
taya dil
jana zirav
bîrova çavan
rişa reş
(promethuûs agirê Zerdeş jê dizî
di belavkirinê de ji nebiyêñ wi vedizî.
tirs nin e birînê!..
ji zayina xwe û heta niha stûtazî,
rênas, amadeye ji birîna giyotînê!..
(sûrê Demokles berevajî min şîdandîye)

li dérsîman bûkêñ bihemil im birîn
li ser, zayenda dergûşa zikê min
bi çıxarekê şert têne girtin
termekî/e bêxwedî me li goptikêñ çiyan
mirovêñ rûkirêt
ji guhêñ min kolyeyan saz dîkin
û xwe pê spehî dîkin
li girtigehan
ji bêhna deryayan dûr
di nava xwîdana xeyalan azadiyê de
avjeniyê dîkim
û inayedake min digiri
di lêpirsinan de
navê xwe jî naselminim
ji rûyê min devêñ min koç dîkin

Celadet im birîn!
li sîrgûnan çîraka ziman li dû xwe dikşînîm
Egîdek im li Gabaran Ewerestan diwelidînîm
bijîkek im li Koçgirîyan Hipokratian diafirînîm
serokek im li çarçiran komarêñ emîrqt dadimezirîn-im
û çiqasî Mazlum im
çiqasî mazlum im
bi qasî serhîdanêñ t



min bêriya te kiriye Mazlûmê min

helkelêlka te
çi qewimiye êşa serê neynûkêñ min
koncalêñ çavêñ xwe dikole
karesatan binax dike
ev çav jî newal in
en qasaban
goristan in
en Helepçan...
Marcos li gitârê nexe
Zilanê nalîsîne
(hemû Etayî û İrayî bi vêya dizane)
pilingêñ tamîlî li Agirî
ihsan Nurî bêpişt bîhelin
Qemerêñ Sor bi Bablekanê naleyzin,
gazî qalind bûye êşa hundirê hestiyêñ min
ji Romayê bi Spartakusan
ji Latîn Amerikayê bi Cheyan
li asoyan serê azadiyan zîl didin.

RÊNAS JİYAN

Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Stenbolê

● 06 Püspör 1998 Şemî: Konser, Berfinna Besta, saet: 15:30

● 07 Püspör 1998 Yekşem: Konser, Berfinna Besta Saet: 14:30

Teatra Jiyana Nû, Şeşemin Salvegera Teatra Jiyana Nû li NÇM'ê tê
pîrozkirin.

● 10 Püspör 1998 Çarşem:

Semîner, 'CMUK' Beşdar: Av. Güç Altay, Av. Ahmet Avşar, saet: 18:00

● 12 Püspör 1998 İn: NÇM, Beşa Sînemayê

Film: 'Danton', derhêner: Andrzej Wajda Saet: 18:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM- İzmir

● 06 Püspör 1998 Şemî:

Konsera Koma Şengal, saet: 18:00

Li BEKSAV'ê

● 06 püspör 1998 Şemî:

Ahenga Biranîna Nazım Hikmet û Ahmet Arif


Beşdar: Suna Aras, Mehmet Özer,

Mustafa Köz, Yenigün Müzik Topluluğu,

saet: 16:00

Bo Bîranîna Musa Anter pêşbaziya Kişikê:

Çinara pîroz aj dide



Komîsyona Ciwanan a HADEP'a Amedê bi navê "Mîhrîcana
Kişikê ya ji bo Yadkîrina Apê Musa" çalakiyek li dar xist.
Pêşbazî ku ev cara duymîn e tê lidarxistin, bi beşdariya
gelek kesên Amedî û endamên HADEP'ê pêk hat.

L i Amedê ji aliye Komîsyona Ciwanan
ya Şaxa HADEP'ê ya Amedê ve bi na-
vê "Mîhrîcana Kişikê ya ji bo Yadkîri-
na Apê Musa" çalakiyek hate lidarxistin. Ev
pêşbaziya ku cara duymîn tê lidarxistin, bi
beşdariya gelek kesên Amedî û endamên HADEP'ê
pêk hat. Pêşbaziye di roja 27'ê gulanê
de dest pê kir û pênc rojan domiya. Di berde-
wama rojê di pêşbaziye de, hetanî finalê di
navbera lîstikvanan de qayıktışandineke
gele-ki dijwar a dostane pêk hat. Heman çalakî par
ji bi boneya jiyandin û geşkirina doza Musa
Anter (Apê Mûsa) hatibû sazkarin. Dîsa pêşba-
zî ji aliye Komîsyona Ciwanan a Şaxa HADEP'ê
ya Amedê ve hatibû lidarxistin. Weki
par, îsal ji 55 lîstikvan beşdarî pêşbaziye bûn.
Pistî pêşbaziye bi sazumankariya Komîsyona
Ciwanan a HADEP'ê şahiye pêk hat. Di şahi-
ye de Serokê Şaxa HADEP'ê ya Amadê Selim
Kurbanoglu axivî. Kurbanoglu, di axaftina
xwe de bi taybetî bal kişand ser pêvajoya da-
wîn a siyasi û rûdanîn dawîn nirxandin. Her
wiha Serokê Şaxa HADEP'ê ya Amedê li ser
helwesta dewleta Tirkîyeyê ya li dijî HADEP'ê
ji rawestiya û ev politika wekî perçeyek
ji politikîn giştî yên li ser kurdan bi nav kir.
Li aliye din Selim Kurbanoglu, qala welatparê-
zi û tekoseriya Musa Anter kir û pêwistiya çalakiyên
bi vî rengî anî zimên. Di heman demê

de di şahiye de hate strîn, helbest hatin xwen-
din û beşdaran hest û ramanê xwe derbirin.

Pistî axaftinan kesên ku di pêşbaziye de bû-
ne ye kemîn, duymîn û sîyemîn xelatên xwe
wergirtin. Di finala pêşbaziye de Deniz Apacık
di rîza ye kemîn de cih girt. Wî wekî xelat, pîrtûka
Ethem Xemgîn ya bi navê "Dîroka Kur-
distanê" ji destê Serokê Şaxa HADEP'a Ame-
dê Selim Kurbanoglu wergirt. Beşdarê pêşba-
ziye yê ku di rîza duymîn de cih girt Duran
Doğruçam ji wekî xelat pîrtûka Mahir Sayın ya
bi navê "Kuştina Mîrê Navxweyî" û pîrtûka
Nejdet Buldan ya bi navê "Erâima Qedexeki-
rî" ji destê Serokê navçeya HADEP'ê Mansur
Reşitoğlu wergirt. Beşdarê bi navê Cihat Kan-
demir ji ku bûbû sîyemîn wekî xelat pîrtûka
Müslüm Yücel ya bi navê "Dîroka Çapemeni-
ya Kurd" ji destê Serokê Komîsyona Ciwanan
ya Şaxa HADEP'ê ya Amedê wergirt.

Wekî tê zanîn siyasedmedar û ronakbîrê
navdar ê kurd Musa Anter (Apê Mûsa) di 20'ê
rezbera 1992'an li bajare Amedê ji aliye kontr-
gerîla ve hatibû kuştin. Gelê Amedê li Musa
Anter xwedî derket û ragihand ku ên ku Apê
Mûsa qetil kirin, ji wan kirî, wê bi tunekirina
çinara mezin û pîroz ew ê ji holê rabe û êdi tu
çinar li welatê kurdan aj nadîn. Lî belê wekî
her karê xwe, dîsa çewt derketin.

ROŞAN LEZGİN/ AMED

TÎSK

Nivisê nûştoxê ma
nêkewt destê ma



LERZAN JANDÎL

Vexwendname

"Bi zimanê mêtîngeran civaka
azad nayê afirandin." Ismail Beşikçi

Ew zimanê ku xwestin bavêjin
gelî û newalêñ dîrokê, careke din
pişkiviya û rehêñ xwe berdan na-
va dil û mîjiyê Welatê Rojê.

Damezirandina Nûnergeha

Azadiya Welat a Mersînê nîşane-
yeke berbiçav a vê geşedanê ye.
Em hemû gelê xwe û derdorêñ
demokrat û azadîxwaz vedixwî-
nin, pîrozbahiya vekirina Nûner-
geha Azadiya Welat a Mersînê.

**Cih: Silifke cad. Bahri
Ok İş hanı. Kat 2. No:51
Tel: (324) 233 83 96
Mêjû: 14. 06. 1998
Saet: 14.00**

Mar û rovî rojekê, bi hev re dimeşin, diçin ber de vê çêm. Dixwazin derbasî aliyê din bibin. Mar ji rovî re dibêje:

– Ez soberiyê (avjenî) nizanim.

Rovî lê vedigerîne:

– Heval were li pişta min siwar bibe. Ez ê te derbasî aliyê din bikim. Mar li pişta rovî siwar dibe û digihêjin nava çemê. Mar xwe li stuyê rovî diwerîne (dialîne) û hewl dide xwe ku, bi rovî ve bide. Rovî bi melûlî axîneke kûr dikşîne. Mar ji rovî dipirse:

– Bira ma çi li te qewimî? Te wisa axîneke kûr kişand?


Rovî:

– Qet pirs neke! Hesreta di dilê min de ew e ku, min bi têra xwe çavên marekî maç nekiriye.

Mar serê xwe tîne ber devê rovî û dibêje:

– Ha serê min maçî bike. Bila ew hesret di dilê te de nemîne.

Rovî vê fersendê ji destê xwe na ke û devê xwe diavêje serê mar û dişidîne. Heya ku reh ji mar xilas dibe didomîne. Dû re rovî mar di be qeraxa çêm, li ser erdê rast di



ke û dibêje:

– A wiha hevalê xwe rast bike, çewti nabe.

Hirç, hêstir û rovî

Hirç, hêstir û rovî dibin destebirakê hev. Li cihekî rûdinin, ji hev temenê hevdu dipirsin. Pêşin hêstir temenê rovî dipirse.

Rovî dibêje:

– Ez baş nizanim lê belê sala ku daweta diya te dikirin, ez wê salê

zarok bûm. Bavê min destê min girtibû, ez anîbûm darî daweta di ya te. Peyre ji hêstir û rovî temenê wan pirs dikan.

– Hêstir:

Wele ez nizanim li ser nala min ni visiye.

Rovî:

– Weleh ez nizanim. Min dibistan nexwendîye.

Hirç dibêje:

– De ka sima (nîg) xwe rake, ez li

nalê te binêrim.

Hêstir sima xwe radike, hirç serê xwe bi bin ve dibe. Hêstir pehîna xwe lê dixe û serê hirçê diperçiqi ne. Roviyê fenek diçe ser serê hirç radiweste û dibêje:

– De here malikmîrat! Ma qey kâlikê te mektep xwendîye? Te xwendîye? Bavê te xwendîye? Kê xwendîye, ku tu bi vê nivîsê biza nibî.

Berhevkar: SOZDAR BEMAL

Cend Helbest ji Zarokan

Biçûk im

*Biçûk im, kurd im
Wek çîk im, pîzot im
Birûsk im vedidim
Bendêne we qet dikim*

Serdar

Azadî

*Li Kurdistanê bûme
bazê ser çiyan
Lez û bez li deştan
Ez bi gazî û guman
Azadî li ku ma*

Gulan

Natırsim

*Natırsîne min
Ne panzêrên we
Ne hovîtiya we
Ü ne jî pesindayina we*

Zozan

Mamik

O mo hildidim
Her du çava kil didim
Kilê, kilê biharê
Tasek ava çinarê
Çinara meqesoka
Kumê hirçê zêrinê
Hirç elimiye ser texta
Yek do dergistî.
*

Tikil, tikil kevano
Hêlik reşo merano
Ne ci zilamîkî bêtore
Ketiye rezê va Tora
Navê jinkê Hingarê,
Agir girtiye delingê

Agrê delingê xwes a
Ne alel li bavê Keşa
Keşe kurê dirdirkê
Riwê jina xwe dihilkê
*

Niza Niza
Li van diza
Xwe qeviza
Rabû beza
Ketin reza
Refen qîza
Cûn nêrgiza
Dibêm: Xweza
Beriya peza
Çelek biza

Ji bo eza
Rajim kûza
Biçim giwîza
Têxime koza
Zarok ji naza
Nema raza
Tirî moza
Xwar ji naza
Nema raza
Tirî moza
Xwar bi geza
Genimê cêza
Ji gûriza
Nayê xwarin
Li dengiza

Niştimana xwe binasin:

Bihuştâbicûk Bircâ Belek

Li Kurdistanê pir cihêne. Dîrokî û spehî hene. Yek ji van jî Bircâ Belek e. Bircâ Belek; li Cizîra Botan, li rexê Çemê Dijleyê ye.

Hezar û şesed sal berê hatîye avakîrin. Bilindahiya diwarên bircê, sîh metro ye. Fîrehiya wê jî bîst metro ye. Kevirên diwarên wê, rîzek reş û rîzek jî ji kevirên spî çêbûne. Li ser deriyê bircê wêneyê du şêran hene. Ji wan şêran yek li Çiyayê Cûdî, yê din jî li Çiyayê Gabarê mîze dike.

Di nava Bircê de qesr hene. Di van qesran de cil heb ode ji bo xulaman hatine çêkirin. Ji xeynî wan, cihêne

perwerdehiyê, ji bo tawanbaran (sûcîdar) girtîgeh, dikan, aşxane, cihê mîvanan û ji bo civatê holeke (poxan) dirêj û mezin heye. Ji bo karwan û rîwiyan jî deh ode hatine amadekirin. Li dora bircê ji bexçeyek heye. Ew bi ava çêm tê avdan. Ü cur bi cur darêne fêkiyan hatine çandin. Ev rewşa hanê, Bircê dike weki bihuştêke bicûk.

Feylesofê mezin ên mîna Ebûlîz, Melayê Cizîrî li vir ji dayik bûne û li vê derê jiyanê.

Belê, êdi zarokê kurd bi dîroka xwe dihesin. Zarokê kurd, vê bihuştê careke din azad dikan.

Destana Vejînê Meşa Azadiyê (2)


Yek ji dîlê Sherê Azadiyê Sadrettin Aydinlik, pirtûka xwe yê sêyemîn "Özgürüğe Yürüyüş (2)" di nav weşanê Aramê de derxist. Berî vê pirtükê, "Özgürüğe Yürüyüş (1)" ji di nav weşanê Belgeyê de gihadibû xwendevanê xwe. Ev her du pirtûkêni vi dümahikêñ hev in.

Ji bo fêmkirina şerê ku iro Tevgera Azadi dimeşine, destpêka wî divê baş bê nîxandin. Ji ber ku kemilîn û gesbûna wê rasterast bi destpêka wê ve girêdayî ye. Şerê ku bi derfetên herî kêm û di mercen herî zor de dest pê kir, bi kijan tengasiya re rû bi rû ma û bi mercen çawa, ev şer heta iro anî ji bo fêmkirina hêmanâ herî girîng e.

Sadrettin Aydinlik ê ku bi çavêr serê xwe bûye şahidê dijwariya serdema destpêkê ya şerê azadiyê, serpêhatiyêñ xwe yê di nava şerê germ de bi du cilda danehev û kirine pirtûk.

Di cilda yekemîn de li ser rewşa hêzîn welatparêz ku bi derbeya 12 rezberê re ji hev belav bûn û hewlêن Sadrettin Aydinlik ên ji bo xwegihandina partiyê hatiye rawestandin. Ji bîli van yekan derketina derveyî welat û pêvajoya Fîlistînî cih digre.

Di cilda duymîn jî piştê perwerdehiyeleskeri û ramyarî vegera welêt û destpêkirina şerê gerîlatî, bi destpêkirana şe-



C

SADRETTIN AYDINLIK

re gerîlatî re ji ber bêazmûneyî û ji mercen nebaş dijwariyê vê pêvojoyê tê vegotin.

Gava ku mirov dest bi xwendina pirtûkan dike êdi mirov dikare hew ji destê xwe berde. Ji ber ku bi qulubandina her rûpelî re; mirov mezinahiya hezkirin û fêdakariyan wan însanîn hê baştîr fêm dike û ev têkoşîn çawa ewqas ges û gur ji ber xwe derdikeve holê.

SERWÎSA ÇANDÊ.

Xwe bispêrin êgir...

HASAN KAYA



Ji xezebê vegerin û bibezin. Bibezin heta ku bêhna we biçike. Di her gavavêtinekê de, bila tûrek guneh ji-we biwe. Ji xezebê û çavşoriyê vegezin û bikenin. Bikenin heta ku nava we bişê. Her dema ku devê we ji hev bû, bila yek kûlîk serê xwe yê nixun rabike. Dibe ku we pêwîstî bi bîharê hebe û bi yek kûlîk hûn bibine xwedî bîharek..

Rawestînin, bigirin serê hespê xwe yê simhesinî. Girêbidin serê hespê xwe yê ku we ji Asyaya Navîn bi xwe re anîbû. Bila rûkê xaka min a dilkeçik bes were strandin, mîna hevîrekî. Serê hespê xwe bigirin û rawestin. Rawestin, dibe ku her du çemên ku kurxaltiyê hev in, Ferat û Dîcle we di hembêza xwe de pak bikin. Jixwe van her du zarakan, heta niha gelek guneh veşartine di paşîla xwe de. Ji bo ku sor û zer nebe rûyê mirovahî, da ku şerm neke mirovahî ji bir kirîtiyê zaliman, rûreşıya gelek zilumkaran xistiye nav dilikê xwe yê pîr û pak.

Vehewînin balafir û firokeyên xwe mîna

teyrîn ebabil. Bila rehet binivin zîro, beq û reqen çeman. Bila serbest bigerin, mişk û mar, xilt, bodbodk, sûsk, kew û kevroşk li çiyan.

Vehewînin ebabilên xwe û bigirin. Bi kûr kûr û zürezüreke hovane bigirin ta ku dengê we bigihîje erşê çaran, pêncan û heftan. Bigirin heta ku dilopa avê di kanîka çavên we de nemîne. Bila kanîka çavên we bimîciqe, dibe ku hêlinâ mîkewekê an jî berfinike nû pişkivî, yê ku bi sorbûna çavên we hatine sotin, vemirin. Bila vemirin da qenebe zarok bîskekê bikenin.

Bibirin dengê topên xwe yê mîna sûra Israfil. Bibirin wî dengî. Qey hûn nizanin ev qiyameta çendan e. Bila ew deng were birînda ku miriyen me yê birînkûr ên ku ne li vir û ne jî li wir tu caran nebûne xwedîyê xeweke şerîn, bîskekê bîhedinin. Bila devê topên we yê wekî devê hûtan were girtin da ku çavên me yê kû rengê asîmîn ê sayî û rengê keskesorê ji bir kirine, bîskekê bîfericin. Bes laşê çiyayê me yê kû mirovahî û şarezayî mîna dergûşa xwe parastine, bîxeyidin. Bes wan şkeftên ku bûne wargehîn derwêş, evdal, pîr û pêxemberan, bifelişînin. Binêrin! Hêj postê pîran dale-qandiye, di wan de şkeftên ku bûne çavkanî ji ol û felsefeyên modern re. Topên xwe huş bikin û werin li ber deriyê van şkeftên kevnare, li ber wan postê pîroz li qelevizka rûnîn. Bexîsandina xwe bixwazin, dilê xwe

Pirtûka haveyna wêjeyê:

Zargotin

zargotin



WESANA INSTITUYA KURDI

germahiya çirokan vemirandine. Bo nimûne pêwîst, biryar, pejirandin, aştî, fermo. Wisa xuya ye ku di naveroka çirokan de destkarî hatiye kirin. Weki mînak peyvîn mîna Kurdistan û Amed li çirokan hatiye kirin. Lewre ev peyv di berhemên gelêri de zêde ne berbiçav in. Dîsa di nava çirokekê de du devôkên cûda hatiye bikaranîn. Li aliyê din pirtûk ji aliyê peyv û biwîjîn ronahî nedîti ve balkê e. Her wiha mirov fêri serpêhatiya hin gotinê pêşyan yêndî kurdî jî dibe.

SERWÎSA ÇANDÊ

yê mîna patoyekî reş têxin destê xwe û bibêjin:

Em êgir dixwazin. Bila dilê me yê mîna pato biqewîne. Lewre çavên dilê me kor bûne. Rehma dilê me nemaye: Hûn rast dibêjin, yê ku em jî xewa giran hişyar kir, agir bû. Yê ku ba û bager, topan û bâblîsok di nav dil û mîjîyê me de rakir, agir bû. Ez bawer dikim hûn ji bes bi dijwarbûna agir pak dibin. Bi agirê Nemrûdê werine şüştin û di ava her du kurxaltiyan de, di çemên Dîcle û Feratê de werine dawerivandin. Dawî destek kîncê spî li xwe bikin. Bila mîna yê me spî be. Û bibezin. Bibezin û ji xezebê vegezin û her ku we gavek avêt, dê tûrek guneh ji we biweše.

Heke hûn di newalekê re bibezin, li serdetê çiyê binîherin. Hûn ê sloganên ku we bi çavşorî nîvîşîne bibînin: "Tîrîk berdêla cîhanekî ye." Heke Agirê Zerdeş bandora xwe dabe ser dilê we, wê demê peyya "şerm" e dê têkeve ferhenga we. An na hûn ê diranê xwe mîna yê guran qîç û guhêñ xwe jî bel bikin û dîsa bibezin.

Em nabêjin dîsa li hespê xwe siwar bin û vegezin. Lî rî dûr e û êdi deş û çiya nikarin debar bikin, ji ber simên hespên we yê hesini. Asyaya Navîn dûr e, em nabêjin vegezin. Lî bibînin. Zarokên welatê Zerdeş bibînin û hûn jî kulmek agir bixwazin ji tîfîka kalê rihsî. Ev agir têra roja we jî dike. Xwe bispêrin vî agir û bijîn.

Cegerxwîn û Mêrikê Şamî

Rojekê Seyda Cegerxwîn û mîrekî Şamî, bi trêne ji Şamê diçin Qamişloyê. Di trêne de dembûherka wan germ dibe.

Yê Şamî dixwaze li ser kurdan hinek meselokan bibêje û bi vî awayî sebra xwe bîne. Mêrikê Şamî dest bi gotina meseleyekê li ser kurdan dike û berê xwe dide Cigerxwîn:

— Rojekê yekî Şamî bizmar di diwarê xwe de dikute. Dike û nake bizmar di diwêr de naçe. Yê Şamî ji xwe re dibêje: “Çima ev bizmar di diwêr de naçe?” Paşê diçê lê dînihêre ku, di cihê ku bizmara tê de dikute, yekî kurd serê xwe daye ber.

Axaftina wan bi vî awayî dom dike. Cigerxwîn dengê xwe nake.


Dighêjin iştasyonê û her du ji trêne peya dibin. Cigerxwîn li dora xwe dînihêre ku, yekî şivan waye li ber pezê xwe ye û kera wî jî pê re ye. Fersenda ku Cigerxwîn lê digeriya bi destê wî dikeve. Mêrikê Şamî û Cigerxwîn berê xwe di din cem Şîvîn. Cigerxwîn dibêje şîven:

— Birazî tu kera xwe nafiroşî me?

Şîvan dibêje:

— Belê ez ê bifiroşim we.

Cigerxwîn:



— Bi çiqasî difiroşî?

Şîvan:

— Bi sed û pêncî wæreqe.

Cigerxwîn:

— Birazî kera te pir biha ye.

Şîvan lê vedigerîne:

— Ma tu nizanî kera min kera Şamî ye!

Cigerxwîn dibêje:

— Birazî, qey kerê Şamî hemû wisa biha ne?

Mirovê Şamî serê xwe dixe ber xwe û wiha dibêje ji Cigerxwîn re:

— Ez bi yekê ketim lê bi sedî jê dernekem:

RIYAD AHMET HASAN

Sê hevalên kêmsihet

Sê heb heval digel hev dimeşin. Yek jê, süt û tazî ye, yek jê kor e û yek jê jî ker e. Bi hev re dipeyivin û babeta wan li ser tirsê germ dibe. È tazî dibêje:

— Weleh ez ditirsim ku hinek bêñ pêsiya me û me tazî bikin!

Ê ku ker e ji hevalên xwe re dibêje:

— Weleh vaye dengê pêxwasan tê!

Ê ku kor e jî dibêje:

— Weleh rast e! Va ye pêxwas xuya bûne û ber bi me ve tê!

SEYDO BAŞÇI

BI XELAT...

XACEPIRSA BI XELAT (123)

XACEPIRSA

Trig. rojan Sekoya îlî namer	N	Peyvîn Mîrekî Şamî name	K	A	E	M	G	T	L
Zerber Mehmetçik îlî namer	J	EHR	S	B			L		O
SAMİ									
DARË	Z	E	A	R	A	Q	Z	V	A
TE	E	L	A	L	D	I	D	N	N
NO	G	E	O	K					
ROJ									
LEK									
PEYVA VESARI									

Bersiva Xacepirsa 120'an

Xacepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 123'yan pirtûka Remazanê Botî 'Zargotin' e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Vesari" di nava qutiyen li bin xacepirse de binivisin û tevi navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesen xeleta hejmara 121'ê qaseta Kazo "Gola Wanê" qezenç kirine ev in: Ferhat Can/Siirt, Salih Dinç/Batman, Murat Öztürk/Yozgat, Ömer Bulak/Amed, Fuat Alpergün/İzmir



Ta Çalakdere ki çaran (wêne)	↓	Cinavkeke kesin Nîk, bal	↓	Payeyekei Ewropî Dawera iridyumê	↓	Helwest Dawera azotê	↓	Tipa pişte 'C' yê Sinarîn, tenkit	↓	Navê klameke kurdi a geléri
Gertafa neyîniyê Gihanekê k	→			Dengdarê 'ron' Rabe- rîkirin	→			Mîna, nola, fena Cinavkek	→	Tipek Anarşî, tevlihevi, alozi
1	↓	Gertafa pişê ...Kurtay	→	6	↓	Veqetan- din Navîn; navê	↓			
Dawera florê	→			Xor, roj Heremki cinavka 'Tu'	→		Tipek	3	Hejmarek	
Talûke	→						Tipa bêre 'Fyê'		Berepaşki 'navber'	
Rol, erk	→							7	Navek	
Bane- şanek	→								Baweriye- ke kevnare	
Xwedênan sî	→			Jîna xwe berdan Nexwe- şîyek	→					
Rêxistiniek	→						Parkîtek	9		
							Dawera argonê			
						a Welat (Rojnamey ek)			

PEYVA VESARI



**ROJNAMEYA HEFTEYİ
(Haftalık Gazete)**

- Xwedi (İmtiyaz Sahibi) M. NURI KARAKOYUN
- Yönetim Yeri İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308 Beyoğlu/İstanbul TEL: (0 212) 251 79 37-251 90 13 FAX: 251 95 85
- Berbirş Karên Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) M. SALİH TAŞKESEN
- ÇAPXANE Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
- Yayın Koordinasyon: Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
- BELAVKIRIN BİRYAY Dağıtım
- NÜNERİTİYEN ME (Temsilciliklerimiz)
- München: (Nünerî Giştî yê Ewriyapayê) Mahmut Gergerli Tel: 49 871 672 29 Fax: 49 871 670 815
- Brüksel: Medenî Ferho 32 532 721 12 03
- Swiss: İhsan Kurt Tel-fax 41 21 652 76 07
- Bonn: Ahmet Baraçkîç 49 228 66 17 40
- Hollanda: S. A. Fewzi 31 104 85 55 43
- Suriye: Jana Seyda Helim Yusiv.

Lejo sûr û lejo sipe

Mianê demseran (mevsim) de, a weşerên wesar o. Wesar, nişanê newebiyina xweza wa. Bi hamayış wesarî pêro xweza hewno derg ê zimistanî ra warzena û heme giyaneweran rê bereket kerem kena. Bêguman wesar hemû welatan de weş o. La belê, wesar welatê ma de vêşer weşo. Welatê ma ke zimstano derg de binê vewre de cil sipey kerdê û mendê zey yew veywa tezi, amayina wesarî de pêto welatê ma seranser zey keynayka bâkire fistano kewe û rengîn dano xo ra.

Gama merdim demsera wesari de welatê ma bigeyro, boy a tewir bi tewir vaşan, boy a nefel û arbûde, boy a reng bi reng vilan ra, xibikan ra, boy a gulanê ceneti ra merdim këfweş beno û xo ra şino (ravêreno). Vengê çûcikan (mîşikan), zerencan, tîtiyan, vengê şalûl û bilbilan, çircilan, şire şirê awa zelal û pake zey şiti ke koyanê berzan ra zey şelalan yena war, xume xumê awa çeman û feratan têdir zey senfoniyêka melodik goşanê merdimî maç kena û xo neselnena (resnenâ) miyanê rihe merdimî.

Welatê ma de wesari germin vêrenê: Na germin bi tija rojî tenî niya. Germinî bi tija tenê nêbena. Nika, hem tija rojî welatê ma germinena, hem ji lej (şer) welatê ma germineno. Lejo ke welatê ma de ramiyeno, hetekî yê pêro neheq, hov, qilîrin û lîmin o. Heto bîn, lejê azadiya şaranê bindestan, insanî, biheq û yê aştî yo. Dagirkir û zalimî ji, di tewir lejan raminenê. Yew tera lejo sûr o û di se-re koyanê berzan ê Kurdistanî de ramiyeno. No şerde şer, piling, zerencê rubati, karxelal û xezalê welatê ma dijmînê nê welafî dir "gozan kenê bare". Lebin ji, yo sipe yo (lejo psikolojîk).



Çekê nê şerî zûrî yê. Çapemenîya dijiminê dagirkir bi nûçe û xeberanê zûri-nana wazenê mejgeş şarê ma dagir bike-rê. Rihê verxodêrî û têkoşerî yê şarê ma bifetesnê. Moralê şarê ma nizim bikerê, bawerî û hêviya azadî û xoserînê şarê ma bişikinê. Yew konsept hadernenê, fi-nenê raye. Nêbi, yewna ... yewna ...

Seba şikitinê no lejo sipey, seba bérz-kerdinê moralê şarê ma, seba xurt ker-dina bawerî û hêviya azadî ya şarê ma endam, ciwan û rayedarê HADEP'a Amedê şarê xo rê çalakiyanê moralî vi-

razenê. Nê çalakiyan ra yew tera, şiyâ-yina, helefani (pîknîk-gezî) ya. HADEP'a Huzurevleri ya Amed, roja peyîn ya wesarî de, bi seyan endamê xo ya şî helefani û wesar oxir kerd û hamnanî ra vat: "Merhaba"

Rójê hîrisê menga Gulani nezdiyê se kes sermayan û endamê HADEP'a Huzurevleri ya AMED'î ya şîm verê Neqe-bê Devan (Deve geçidi). Xora daristanê verê gola neqev Devan cayê helefani û her go rojo şeme û yewşem bî, hezaran şar Amed ra seba boydayin şino ew ca.

Ma gama saet newê sodîrî de risay wijâ, bi seyan wesaftî ameybî wica û şar, bi kal û pîran, cenî û mîrdan, zav û zê-çan ra miyanê darîstanî de bîbî vila. Pe-las û mersikî erd de finiyay ra. Her kes ronîşt û ma ara xo kerd. Arakerdin pey-ra xortan û keynan dest bi deyran kerd. Vengê deyran, çepikan û tilîliyan zey vengê şalûl û bilbilan iyanê darîstanî de tewrê vengê teyr û tilûran bi. Helbestî wanyay, deyri vajyay û pêro piya tepsi-yay govend.

Îyê ke xo bi xo ameybî senî ke no halê ma dî, ê ji amey û kewfî mabenê go-vend. Nê halî peyra darîstanê Neqe-vê Devan bibi zey meydanê mîtingî. Hemû destî hewadiyay hewa ra û pîrin piya işareta serkewtin kerdê. Hetê şaniya ji ciwanan yew pêşbaziyê persan amade kerd. Pêşbaziyê persan de persê dîrokî, siyasî û çandî amey perskerdin. Peyniye de xeylê ciwanan A.Welat û Jiyana Rewşen qezenc kerd.

Peyra fina govend dest bi ci kerd. Ver-rê Def û Zirna de "Delilo, Dicade, Yew-nig, Esmer, Kî ne em" vajiyê. Hele ga-ma ke Bablekan ameynê kaykerdin, ci-wanan figurê şerî û reqs têdir mundêne, a game, bi hezaran şar bi çepik û tililiyan ray de zerê xo perneynê serê Kosipêy, Kosûr, Cûdî û serê Koy girî.

Kam eşkeno bawerî û hêviya azadiya nê şarî bipelişno. No şar hetê ra lej keno û heto bîn ra bi govend û dîlanana kîf keno. Bîlê senî ke A. Arif yew helbesta xo de vato: "Nê koy ci rey merdimî şer-me de nêternenê", bi no tewir, ger yew vernî nê şarî de zerî ra û bi rastî rîberî bikero. No şar, ci rey merdimî şerm de nêterneneno.

ROŞAN LEZGİN/AMED

Xwediyyêñ welatê dagirkîn Gelê Same



Hetam sala 1950'yi, li dibistanan, xwendin û nîvîsandina bi zimanê Sameyan qedexe bû. Piştre, di dibistanê seratayî de perwerde bi zimanê Sameyê hate kirin. Li gelek zanîngehan besê Sameyan jî hene.

Gelê ‘Same’ ango ‘Lapî’ xwedî dîrok, ziman û çan-deke kevnare ye. Welatê wan “Sapmi” di nav wela-tên Swêd, Norvêc, Finländiya û Rûsyâ-yê de hatiye parvekirin. Hejmara wan, bi qasî 70-75 hezaran e. Bêhtir, bi xwe-dikirina pezkovî û xezalan dadikevin.

Direk & doğrudırına Sepmüs

Berî niha bî 10 hezar salan, li Îskan-dînnavayyê serma û qeşa bû. Piştre qeşa dihele û mirov têñ li vir bî cih dibin. Xelk li wir zêde dibin û ber bî reşâhiyê ve diçin û li wir xaniyan ava dikin. Li gorî lêkolînên arkeolojîkî ku li bakurê Îskandinavyayê hatine kirin, li vir gelek nîrxên dîrokî, kû pişta xwe didin berî zayînê bi 1500 û 300 salan, hatine peydakirin. Nîrxên arkeolojîk, bi taybetî li ser müjilahiya bavpîrên Sameyan mirov ronî dikin. Pêşiyêن wan, ji malbatêñ bi-çük, malbatêñ mezin û eşiretan pêk dihatin. Her eşiretekê sînorê wê diyar bû.

Di 1751'ê de, cara yekem, bêyî ku cihen Sameyan li ber çavan bêñ girtin, Swêd û Norvêcê sinorêñ nav xwe diyar kirin. Li gorî "Peymana Lappkodicil-ler"ê, mecalâ Sameyan hebû ku ji bo xwedikirina pezkovî û xezalan cihê xwé biguherînin. Li gorî tixûbên nû, malbatêñ wan di nav du dewletan de das bes bîþîn.

Xwedikirina pezkovî ū xezaan

Pezkovî û xezal, li hemberî hemû demsalan, li hemberî germâhî û serma-yê dikarin xwe biparêzin. Çerm ango betanê wan, xwe li kîşwera (iklim) hêrêmê amiye. Ji bo bêhnkirinê, bêvila wan pir pêşketî ye. Bi hêsanî dikarin xwe bigihêjînin giyayên bin berfê.

Gelê 'Same' ango 'Lapi' xwedî dîrok, ziman û çandeke kevnate ye. Welatê wan "Sapmî" di nav welatên Swêd, Norvêc, Finlandiya û Rûsyayê de, hatiye parvekirin. Hejmara wan, bi qasî 70-75 hezaran e. Same li welatên ewlê dijî, wekî dewle mendiyeke çandî tê dîtin. Alîkariya wan, ji awira çandî, dîrokî û zimên ve tê kirin. Nasnameya wan tê nasîn û bi azadî li ser xaka xwe dijîn.



bi dêran ve hatine girêdan. Hetanî salâ 1950'yi, li dibistanan, xwendin û nivî-sandina bi zimanê Sameyan qedexe bû. Piştre, di dibistanên seratayî de perwende bi zimanê sameyî hate kirin. Li bajare Kautokeîno zanîngehek heye ku li wir, gelek ders bi sameyî têne dan. Li gelek zanîngehan besên Sameyan jî hene. Zimanê wan dikeve nav koma Uralan. Zimanê sameyî ji aliyê xwezayî ve têra xwe dewlemend e. Sê diyalektên wê he-ne: Sameya Navendî, ya Rojhilatî û ya Basûr.

**Parlamento ù
dangereux netevey!**

Same, bi hejmara xwe hindik in. Li Swêdê 17.000, li Norveçê 45.000, li Finlandiayê 5000 û li Rûsyayê jî 2000 kes dijin. Di dîroka xwe de, di warê politik, civakî û leşkerî de bi tevayî orgânize nebûne. Lewma pirsgirêkên wan ên li ser mîras, neteweperestî, asîmîlas-yan û xwedîkirina heywanan bi tevayî çareser nebûne. Nêzîkbûna wan li hev û du, pişti salên 1900’î çêbûye. Ji bo çareserkirina beşek jî van pirsan, 1956’ an de “Yekîtiya Sameyên li Welatên Bakur” ava bûbû. Berê vê yekîtiyê li hevkariya Sameyên li Swêd, Norvêc û Finlandiyayê bû. Di roja me de, Sameyên li Rûsyayê jî tevlî vê yekîtiyê bûne. Van xebatan di sala 1972’yan de fêkiyek dimda û li Finlandiayê “Parlementoya Sameyan” ava bû. Piştre, di 1989’an de li Norvêcê û di 1993’yan de li Swêdê ji parlamentoyê wisa ava bûn.

Dema mirov bixwaze bi néríneke te-vayî li ser dezgehêwan ên fermî û we-zifeyêwan raweste, dikare vê bibêje: "Meclîsa li Norvecê li bajarê Karasjoh-kayê ye, ya li Finlandiyâye li Înarî ye û



Xwezaya Sameyan ji heywan, erd û avê pêk tê

Serokê Parlamentoya Sameyan a li
Swêdê Ingmar Ahrêm: "Rewşa me
ya kurdan ji gelek aliyan ve mîna
hev e. Em dixwazin bi dilxweşî
ser rewsa kurdan bêñ agahdarkirin."

ya li Swêdê li Kiruna ye. Navenda yekîtiyê jî Ohcezokka bi ser Finlandiyê ve ye. Armanca van saziyan, xurtkirina hevkariya dezgehêن Sameyan e; parasin û pêşxistina ziman û çanda wan e. Her wisa, ji bo lêkolînêن zanistî Înstituya Sameyan li Norvecê, ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwedîkirina xezalan Federasyona Sameyan li Norvecê, ji bo karkerêن li derveyî xwedîkirina heywanan Same Etnama li Swêdê, Federasyona Yekîtiya Ciwanêن Sameyan li Norvecê, Yekîtiya Jinêن Sameyan li Norveçê.

Belê. Pirsgirêkên Sameyân ên rojane hene, wekî asimîlasyon, neteweperestîya li hemberî wan û bindesti. Lê, gelê Same li welatêن li wî dijî, wekî dewle-mendîyeke çandî tê dîtin. Alîkariya wan, ji awira çandî, dîrokî û ziman ve tê kîrin. Nasnameya wan tê nasîn û bi aza-dî li ser xaka xwe dijîn.

Serokê Parlamentoya Sameyan ya li Swêdê Ingmar Ahrêm, li ser rewşa sameyan ji me re wisan got: "Daxwaziya me ew e ku, li welatê xwe, em berî neteweyên din ji tevahiyêñ kanêñ xwe sûde wergirin. Rewşa me û ya kurdan ji gelek aliyan ve mîna hev e. Welatê wan jî hatîye parvekirin û ji aliyê welatê din ve tê idarekirin. Em dixwazin bi dilxweşî li ser rewşa kurdan bêñ agah-darkirin.